

## "Gule kuhikan vedikin" An birînan vedikin?

Rüpel 3

Heyveyîna Helim Yusîv:

Rewşenbîr dikare nebe hevparê  
şaşîtiyên siyastvanan

Rüpel 8-9

Amek Dieterd:


Trêna Aştiyê ji bo  
dewleta trk sînyalek e

Rüpel 10

Mirhem Yûş:

Malbata dixwenedîtî û hin  
rêxistinê me

Rüpel 7




Heybet Bayê Helepçê:

Nihertineke pêşendayê



Cevdet Demiroğlu:

Agîf bêxwedî nema



Azad jiyan:

Li Enqereyê çalakiya çanda kurdî

## Jî Xwendevanan

*BI serê azadiyê welatê me iro dibe bihuşa cîhanê. Di 13 saliya 15'ê gelawêjê de, li her çar aliyênen welat bi meşa Egît û Zilanîn bû agirê azadiyê. Ew roja pîroz iro dikeve çardeh saliya xwe. Di 15'ê gelawêjâ sala 1984'an de agirê ku li Kurdistanê vêket, çardeh salan sün de, diwaroja gelan roni dike.*

*Di çardeh saliya 15'ê gelawêjê de jî em bawer in ku, hûn xebatkarên Azadiya Welat, ji bo meşa gelan tiştê ku ji destê we tê, hûnê pêk binin. Bi vê baweriyê, em cejna 15'ê gelawêjê li we pîroz dikin, di xebata we de serkefinê dixwazin*

### GİRTIYÊN PKK'YI / BARTIN

*Ez xwendevanekî we me. Ez niha li Kulu dîmînim. Em karkerenî inşeatê ne. Hejmara me digihêje pêncsedî.*

*Li vir karkerenî welatparêz bi gelekî rojnameya "Gündem" dixwînîn. Dema ez ji wan dipirsim "çima hûn A. Welat jî naxwîn?" piraniya wan ji nezarîna xwendîna kurdî sîkayet dikin. Lî ez hetanî dikarim dixebitîm ku wan iqua bikim. Îsal heta niha min sê aboneyê A. Welat peyde kirine.*

*Herhal hûn baştır dizanîn, lî ev bûn du hejmar ku ev hevalen ku min qala wan kir, rojname peyde nekirin. Yanî ez dixwazîm bêjim ku rojname hindik tê vir. Ji ber wê ye-kê ev hevalen ku min qala wan kir, rojname ji bayiyan peyda nekirin û hatin gazinc ji min kirin. Eger munkam be ku hûn hejmaren rojnameyê zêdetir bisînin, emî kefîxwes bibin.*

### XEBATKAREKÎ İNŞEATÊ KULU / KONYA



## Romana şoreşê

SAMÎ TAN

**D**emekê li ser romana şoreşê gelek gotübêj çêbûrî, nivîs hatin nivîsandîn. Niha ew gengeşî kêm bûne, zêde tişt nayen nivîsandîn. Ev gengeşî bi giranî nav rewşenbîrê li Ewrûpayê de ma. Ji bilî çend nivîsen ku di rojnameyê rojane yên tirkî de derketin, çend nivîskarên rojnameya me jî li ser vê mijarî di quncikên xwe de dîtinên xwe anîn zîmîn. Mijar di çend bernameyê MED-TV'ye de jî hatibû rojeyê. Piş re devê vê mijarê hate girtin.

Di piraniya nivîs û axaftinê li ser mijarî de du xal derdiketin pêş. Xala yeke-mîn zimanê romana şoreşê bû, xala du-yemîn jî rengê kesê ku wê vê romanê binivîse bû. Di bernameyê MED-TV'ye de nivîskarê kurd Firat Cewerî li ser xala yeke-mîn, pirsek arasteyî Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan kir. Wi jî da za-nîn ku di vê romanê de tiştê ji zîmîn gi-ringir naiveroka romana şoreşê ye. Paşê jî da xuyakîrin ku bi zimanê kurdî nivîsina romaneke bi vî rengî ji ber arîşeyen wî zimanî geleki dijwar e.

Di heman bernameyê de rewşenbîrê kurd dan xuyakîrin ku divê nivîskarê ro-

maneke bi vî rengî ji nava ser be. Lî Serokê PKK'ê ev dîtin rexne kir û diyar kir, ku pêwest nake ku nivîskar jî nava ser be, bes bila bi awayekî zanyarî nêzîkî mijarê bibe.

Îsal ji hêla du saziyên kurdî ve, pêşbaziya kurteçirokan hate lidarxistin. Yek ji van pêşbaziyan, ji hêla Beşa Hunerên Dîtbarî ya NÇM'ê ve, ya din jî ji hêla TAYD-DER'a Îzmirê ve hat lidarxistin. Li ser daxwaza van saziyan, me di nava komîteya hilbijer a her du pêşbaziyan de jî cih girt. Digel gelek berhemêni bi tirkî, birek berhemêni kurdî jî ji bo pêşbaziyan de hâtine şandin.

Encama pêşbaziya TAYD-DER'ê diyar bû, ji berhemêni ku gihîştin ber destê me, ji ber tengbûna demê, me yên kurdî nîxandin. Di nava wan de hejmareke mezin ji girtiyen azadiyê yên ji Girtîgeha Bartinê hatibûn. Dîsa hejmareke mezin ji berhemêni ku ji bo pêşbaziya NÇM'ê hâtine şandin, ji vê girtîgehê hatine birêkin. Ev kurteçirok her yek dîmenêke cihê ji şoreşê pêşkêş dikin. Her çiqas ji ber egeren pêşbaziyyê wekî kurteçirok hatibin nivîsin jî, her yek mijara romanekê ye.

Di warê zîmîn de jî tu pirsgirêk derneke-tye pêşberî wan, bi kurdîyeke xwerû hâtine nivîsandîn, tiştê pêwest bi tenê redak-siyoneke xurt e.

Ev mijarâ ku dibêje wê kî romana şoreşê binivîse, gengeşîyeke di nava cepgi-rên tirk ên berî cuntaya 12'ye rezberê de tîne bîra mirov. Wê demê birek şoreşge-rên tirk digotin wê şoreş ji çolteran dest pê bike, birê din digot na divê li bajaran dest pê bike. Li ser vê yekê Can Yücel li cihekî gotibû, şoreş wê ji "Kirşehir" dest pê bike. Em jî dibêjin, rast e, divê nivîskarê romana şoreşê ji nava şoreşê be, lê hewce nake ku şervan be. Rast e, şer ali-yekî şoreşê ye, bêguman aliye herî girîng e, lê dîsa jî hemû şoreş ne şer e. Kes nikare vê yekê red bike ku divê romana şoreşê, pîralitiya wê nîşan bide. Yanê jî jiyanâ serokatiya tevgerê bigire, heta jiyanâ gundiyekekî welatparêz; ji gerîlayekî bigire, heta rewşa welatparêzî li metropolan; ji şewitandina gundan bigire, heta psiko-lojiya leşkeren tirk û cerdevan; ji hest û ji ramanen xaziyen (gazî) şer bigire, heta têkoşîna dîlîn şoreşger û gelek aliyen din ên şoreşê mijara vê romanê ne.

Tiştê ku di vî warî de jê re gengeşî na-vê ev e; divê nivîskar xwe ji dil û can bi-de vî karî, kedeke mezin bidê, belki bi salan li ser xebatê bike. Her wiha dibe ku romanekê bi dehan cîld derkev, an jî bi dehan romanen cihê derkevin rastê. Di vî warî de ji servan bigirê heta rewşenbîrê welatparêz, bâr dikeve ser her kesî.

## Çima em naxwînîn?

Q. DÊRSILAVÎ

**D**i programeke MED-TV'ye de ku li ser her du lehengen mezin Mazlum û Mahsum bû, gotineke besdarekî bala min kîsand. Gotin ev bû: "Kawayê Hemdem pir dixwend." Vê gotinê ez birim beriya 12'ye rezbera 1980'yi. Ez pêsi vê ji bibêjim: Min ev taybetiya Mazlum ji hînek mirovên dîtir jî bîhistiye, carina ku derfeta wî ya derketina derye tunebûye tim xwendîye, zemanê ji bo xwarin û razanê jê re tune bûye, bi deh rojan bi bist rojan, rojê 20 saetan xwendîye. Weki her taybetiyen wî yên dîtir di vê babetê de jî kesî nikaribû xwe bigîhûne zatê pîroz.


Belê şoresger û welatparêzen wê demê ji pir dixwendin. Weke ku em tev dizanîn ku wê demê kovar, rojname û nivîsen me hem kêm bûn, hem qedexeye li ser wan gelek dijwar bû. Xwes tê bîra min ji bo ku em kovar an belavokeke şoresgeri bixwînîn me gelek tehlîke digirtin ber çav û me quruşen (pere) berika xwe yên dawî jî ji bo wan didan. Gelek belavokêni ku bi teknikên xirab hatibûn çapkirin heta ku me dixwend çavê me kor dibûn. Bi mehan li ser wan nîqas dihat kirin. Hemû pirtûk û

Ma ne şerm e ji me re ku em 30-40 milyon bin û rojnameya Azadiya Welat trajecta xwe negîhîne 300-400 hezarî. Gere he defeke me ya grîng jî ev be û ji bo her kurdî divê wekî ferza limêjê be.


doktrînen Marks, Lénin û Stalîn, bi coseke mezin dihatin xwendîn. Trockî, Dimitrov û gelek doktrînen dîtir jî tim li ser zimanê me bûn. Bila neyê vê wateyê ku min beriya wan nîqasen bê oxur (weke sosyal-împeryalizm, revîzyonîzm û hwd.) kiriye, bila ew roj herin û qet li paş xwe venegerin. Lakîn jî hêla xwendînê ve gava ku ez li vê demê dînihêrim, ez gelek xemgîn dibim. Ma ev ci bi me hatiye, mirov dibêje qey me hemû nakokiyen xwe ha-kirine û welat bûye gul û gulistan, êdi me mîjîye xwe daye rawestandinê (îstirahatê). Li ser sedemê vê rewşê carinan difikirim. Ka gelo ev ci bi me bûye? Yek ji van sedeman ev e, em hewisîne (fîrbûn) hazırlîye, em dibêjin (weke gelek kar û emelê dîtir) bila ji me re hazir were ber me. Êdi çawa be hinekan bar û hêzên giran dane ser xwe û wê ji me re war û welatekî azad ava bikin.

Lê me çand û hunera xwe jî spartîye wan. Êdi rewş ne wekî berê ye, imkan pir in, qet nebe em li ziman û çanda xwe xwedî derkevin. Ma nayê bîra kî me bo ku em elfabeyeke kurdî bi des bixin me çiqas ked dida. Me hezar rî dûrb diceribandin, tiştê nemayî bi ser me de dihatin. Ica tro pir weşanen bi zimanê me hene, em dîsa jî naxwînîn. Ma ne şerm e ji me re ku em 30-40 milyon bin û rojnameya Azadiya Welat trajecta xwe negîhîne 300-400 hezarî. Ez dîbêjim gere hedefeke me ya grîng jî e be. Ev tişt ji bo her kurdî divê wekî ferza limêjê be. Xelk û alem jî wê vê eybji me bipirsin.

Kanî ew xwepêşdanvanen ku sed hezar bûn? Ma xwendîna Azadiya Welat ji wan çalakî û berxwedan astengir. Heta kengê wê dijminen me bibêjî 'zimanê ku nayê zanîn' (bilinmeyen bî dil). Qe nebe "werin em tev bi dil û ca seferberiyeyeke xwendîn û nivîsandîna zimanê kurdî" li dar bixin. Ji heftê carek Azadiya Welat bistînîn û em wê bixwînîn. Hinga hûnê tam û lezeta xwendîna zimanê kurdî fîr bibin. Hûnê feshîyî zimanê xweyî jî bi bingehî hîn bibin. Gere ev ji me re pêwest be û em rojekê zimanê xwe hîn bibin.



**HADDE** Şaxa Stenbolê, rapora îhlalên mafêñ mirovan ya meha tîrmehê eşkere kir. Daxuyanîya ku ji hêla Serokê IHD'ya Stenbolê Ercan Kanar ve hate dayîn îhlalên mafêñ mirovan bi van rengan qewimîne: Hejmara kesen ku hatine binçavkirin 305, ji vê hejmare 68 kes jî, 7 kes jî zarok in. Di provakasyonê girtigehan de 6 kes hatine kusîtin, 51 kes jî birîndar bûne. Di çûn û hatina dadgehan de 16 kes bûne hedefen êrîşan. 7 kes laqeyî êrîşen çekdarî hatine, 94 kes ji kar hatine avetin. 3 rojnamevan hatine binçavkirin, 17 rojname û kovar hatine berhevkin. Çar sal û 20 roj cezayê hepsê û milyarek û 345 milyon TL cezayê pereyan ji bo dîtin û ramanan hatîye birin.



**SEKRETERÊ** Giştî yê HADEP'ê Hamit Geylani daxuyand ku, pişti êrîşa gerîyan a 8'ê gelawejê, tevahiya navenda Culemêrgê ji hêla tîmîn taybet û polisan ve hatîye gulebarankirin. Geylani dide zanîn ku, pişti bûyerê kesen ku ji qada şer dûrin jî, bûne hedefen hêzên dewletê û ji 100'î zedetir endamên HADEP'ê ku di nav wan dé rayedar Abdulkadir Garipgazioğlu û Mustafa Tan jî hene, hatine binçavkirin. Geylani, Wekilê Walyê Culermêrgê tawanbar kir û got: "Heger Wekilê Walî, mîna fermandarekî tîmîn taybet tevbigere kes li hêremê namîne." Cigirê Sekreterê Giştî yê HADEP'ê Abdullah Kaya bi daxwaznameyekê serî li Wezareta Karê Hündirin da.

## NÜÇE

# "Gule kulîlkan vedikin" An birînan vedikin?

Hebûna cerdevanan bi kêrî dewletê tê. Ji ber ku hebûna feodalîzmê bi vê yekê tê parastin. Bi vê yekê kedxwarî hêsanter dibe. Li cîhanê ji bili me tu dewletê ku piştgiriya sîsteme axatiyê dikan, tune ne.

**L**i Kurdistanê, ev 13 sal in bi piyanî di meha gelawejê de şer digihêje asta herî bilind. Li "Welatê rojê" bêhna şer difûre. Meha gelawejê ji bo dewleta tirk xewnerek e. Lî, digel vê rastiya berbiçav çapemeniya tirk bi şêweyekî sîstematik Kurdistanê weki "bihuşt" bi nav dike. Hefteya raborî, di rojnameya Milliyetê de li ser Dêrsimê bi navê "Bajare di bin siya terorê de" û di rojnameya Yeni Yuzyilê de jî bi navê "Rûçikê Başûre Rojhîlat ê ku diguhere" du rêzenivis hattin weşandin.

Ji van rêzenivisan bi taybeti ya Refik Durbaş a ji bo rojnameya Yeni Yuzyil Balkêş e. Ji ber ku Durbaş bi helbestvanê navdar Ahmed Arif re hevalti kiriye û li ser jiyana wî pirtûkek jî nivîsandiye. Lî, xuyaye ku Refik Durbaş rastiyen Kurdistanê li gorî daxwazên xwe hûmanîne. Her çiqas Durbaş gotiye: "Mermiller çiçek açıyor (Gule kulîlkan vedikin)" jî, di nav rêzîn nivîse de mirov dikare di rastiya Kurdistanê bigihêje. Lewra Durbaş qala nebûna ewlehiya rîyan dike, diyar dike ku wan nikaribûye bikevin Lice û Dihê (Eruh) yê. Her wisa rojnamegerê tirk digel di çavdêriyên xwe yên der barê Hezexê de xwesbîniya xwe tîne zimîn û dibêje, pirtûkxaneyen nûjen hatîne sazkin, sîstema perwerdehiyê bi kompûterê hatîye danîn, lê di heman katê de diyar dike ku, mamoste nehatine Hezex û ji 74 dibistanan 13 vekirî ne. Li gorî agahiyen Durbaş, li Hezexê di rojekê de 4-5 kes ji ber nexweşîna tîföyê serî li naxweşxaneyê didin û gelê hêremê jî ji ber nebûna avê qir dike. Ava heyi jî nayê klor kiran.

Wekî tê zanîn demek berê mirovîn ku li ser tingan (çop) nan berhev dikirin, di rojê de demeke dirêj mabû. Rojnameger Refik Durbaş di nivisina xwe de qala zarokên ku di nav tingan de dijîn, dike. Lî ne bi şêweyekî rexneyî. Li gorî Durbaş, zarok ji jiyana xwe memnûn in.

Lî digel wan nirkandinên xwesbîn, rastiya Kurdistanê êdî xwe bi mirovan dide pejirand. Wekî mînak mebûsê CHP

Algân Hacaloğlu berî çendekî di serdanna xwe ya Amedê de wiha gotibû: "Ez şok bûm. Min ji çavên xwe bawer nekir. Serokê partiya me ji têv de hemû serok di warê vê keshîye de sersar in." Lî nirkandinên balkêş ji aliye rojnameger û amadekarê bernameya "Bam teli" Tayfun Talipoğlu ve hatîne kiran. Talipoğlu li ser rêzenivisên navborî pîrsen me bersivandin.

### Tayfun Talipoğlu: Em bûne esîrê tîrsa xwe

*Hün weki kesekî ku herêmê baş dînase, van rêzenivisînê dawîn çawa dînirxînin ?*

■ Ku tu a rast bixwazî, kekê min! ji bo Babîl tiştekî ku nedîtiye tuneye û ne rast e. Li Başûrê Rojhîlat tu guherin pêk nehatine. Bila 25 km. nêziki Liceyê bibin em wan bibimîn.....!

*Belê, bi dîtina we dibe ku ev rêzenivis li dijî "Trêna Aştiyê" weki anti-propaganda hatîbin amadekirin? Ji ber ku çapemeniyê jî vê çalakiyê re çav û guhêñ xwe bi şêweyekî pihêt girtine ?*

■ (Bi ken) Jixwe niha çapemeni şîrînmehîya (balayı) xwe bi hikûmetê re dijî û ji bo ku bi hikûmetê jî şîrînmehî bide jiyandin, dixebe.....! Ji ber vê yekê bêdengiya çapemeniyê tiştekî asayî ye. Jixwe hün jî dizanîn çapemeniyê bi gasî maweyekê piştgiriya hemû hukûmeten nû dike. Çapemeni ji bo hikûmetê maweyekê diyar dike, li gorî wê tevdigere.

*Bi dîtina, Yerlikaya dewlet ê di bînî geha xwe de nexwaze sîstema cerdevantîyê ji holê rake ?*

■ Raste kekê! Belê ez jî wekî Yerlikaya difikrim. Sîstema cerdevantîyê di destpêkê de tiştekî çewt û şas-bû. Cerdevantî tiştekî bi dil e. Wekî mînak li Erzinganê heye, hin kesan bi hincta xweparastinê ji dewletê çek xwestine. Ez vê fêm dikim. Lî, gava ku cerdevantî



Ji van rêzenivisan bi taybeti ya Refik Durbaş a ji bo rojnameya Yeni Yuzyil Balkêş e. Ev kes ku bi Ahmet Arif re hevalti kiriye, dibêje li Kurdistanê "Gule kulîlkan vedikin" lê wêneyê jorîn rewşê diye dike.

ji bo rantê hat kiran, wekî ku tê dîtin ev kes dê ji bo ku şer neqede her tişti bike. Li Culemergê li polisan ji min re got: "Bi Xwedê, li vir terorîstek tune ye. Ev bi xwe bûyeran pêk tîmin." Bi rastî jî wisa ye. Disa, li Culemergê li gundekî avetiye ser qereqola gundê cerdevanan, lê wan berikek jî neteqandine. Li ser vê yekê çekêwan ji wan hatine standin.

Ev ne cerdevantî ye! Ev kes bi kêrî cerdevantîyê jî nayê. Lî, ev rewş, bi kêrî dewletê tê. Ji ber ku hebûna feodalîzmê bi vê yekê tê parastin. Ev jî ji bo berjwendiyen dewletê tiştekî baş û guncaw e. Bi vê yekê kedxwarî hêsanter dike. Li cîhanê ji bili me tu dewletê ku piştgiriya sîstema axatiyê dikan, tune ye.

*Hün jî gelek caran çûne herêmê, çavdêriyê we gi ne?*

■ Ji min re dibêjin: "Tu her dem li ser Rojhîlat nûçeyen amade dikî. Ji nûçeyen te reşbînî difûre." Baş e! Ma tişten xwes hene, em nanivîsin? Cara yekemîn min li ser Hezexê (îdil) nûçe çêkir. Ew pişti min çûn Hezexê. Lî, min bi şêweyekî din rewşa Hezexê pêşkêş kir. Ev navce, ev 7 sal in, bê dibistan e, kesen ku mamostetiye dikin ji bi xwe ji xwendinê û nivîsandinê fêm nakin. Tişten bas gelekî kêm in. Büyera cerdevantî


nîn Cizîrê her tişt derxist holê...!

Binêre, ev 12 sal in ez rojnamegeriyê dikim. Her wiha ev-11 sal in ez diçim herêmê, têm. Ev 11 sal in li vî waleti şashîtiyek tê kiran. Ev 11 sal in rayedaren dewletê yê rojnamegeran jî rojnameyan hildigirin. Pêşî dibin Amedê, piştre Mêrdînê. Li Mêrdînê du sê zilamên ku di dest û piyên wan de bombeyen destan hebûn dianin cem me. Wan kesan digot: "PKK'ê mirovîn me kuştin, bila Xwedê bela PKK bide." Piştre ev kes ê herin. Balkêş e, min bi xwe dît hin kes çend çaran anîbûn.....!

*Ji ber naveroka nûçeyen xwe bi awayekî sergirî an vekiri, hin der û dor ji bo we aciziya xwe diyar dikan ?*

■ Çawa ku ez rastiyen di navbera rîzan (satir) de tînim zimên, ew jî bi heman şêweyî bersivê didin min. Lî, kesen ku piştgiriya min dikin jî, hene. Ez dixwazim mînakekî bidim. Subayekî rojekê raporek daye û gotiye: "Pişti çalakiyeke PKK'ê nîzanim çend leşker hatîye kuştin. Lî, di vir de rola kêmasi û bêdisipliniya leşkeran jî heye." Lî, sûbay pişti vê rapora xwe hatîye tazî (azar) kiran.

# Nihêrtineke pêşendayê



**E**v salên dawîn destpêka qonaxeke dîrokî ne. Ne tenê ji bo gelê kurd, lê ji bo hemû gelên Rojhilata Navîn. Ev dem wê taybiyê xwe di mêtî, raman, asoyê man-dî, mêtû û jiyanê de berz û diyartir bîke.

Wiha, der barê vê mijarê de ez dixwazim li ser çend layan rawestim:

Layê yekemîn; Cihan bi rengekî gêlempîr di qonaxeke veguhestokî de dibihure. Ji ber ku pêwendiyêñ aborî, her bi her diherikin û di şûna wan û çavkaniya xwe de rê didin pêwendiyêñ nûjen. Pêşveçûna elektronî hembêza pêwendiyêñ kevn difitiqîne û li gorî merc û agahiya xwe pêywendiyêñ nûjen ava dike, lê li pêşberî vê serhatê (rûdan), tu kes ji ramavanêñ cihanî xwe newestandiye û xweşik venekolaye. Lewma nihêrtinêñ sosyalistan pir û pûç in û di warê zanînê de, bi kêmâsi ne. Ji ber van egeran, ez navê (piştî împeryalizmê) li vê qonaxê dîkim.

Layê dutyemîn: Ramana navniştîmani di astengeke axivî de ye:

I. Rêexistin û wazên (teorî) komunîst, di warê îdeolojîk de, li paş dîrokê radîwestine hew dikarin xwe bi pêş bixin, ev jî vedigere du engîzan:

Ê yekemîn: Ew, bi rastî, nêçika xwestî li ber xwe winda kîrine, geh ji çimekê li maoîzmê vedigerim, an çimekê xwe dispêrim stalînizmê.

Ê duwemîn: Qonaxa dîrokî, bi angora têkiliyêñ aborî, civakî ji ramana marksiyê derbas bûye. Ji ber ku dîsa, pêşveçûna elektronî, ramana xwe li angora xwe ava dike, ji lewre dijberî di navbera wê û ramana Marks a kevnare de peyda dibe.

II. Nûjentirîn wazên sermayedarı, di hundîrê civata nû de.noq bûn:

Pragmatizm (William Jams) bi rengekî xav, li babetêñ hozanyariyê yên herî girîng dinihîre, ew (xwedan, dem cî, eyîm, sermed.. û hwd) bi sûdewatiya wan rîpîvan dike.

Heyimyatî (varoluşçuluk) (Sartre) xwe di serhatiya eyîmê de mirandiye, ji ber ku nexweşiyêñ civakî yên sermayedarı, her dem, li ber çavêñ wan bûn. Ji lewma, ew di warê hozanyariya bîrdozi

de parek xweşik venegirtin.

Struktualizm (yapısalçılık) (Lêvî Straus – Di sosêz)

Ji naveroka nêzîktiyê derbas nebûye û mikaribûye mîna dibistaneke hozanyarî xwe bi cih bike. Ji lewma, ew di hundîrê gelek dibistanêñNEYEKSANE de peyda dîbin, nimûne: Freud, Marks.. û hwd.

Xwedanyatî bi hemû nifş û cezayêñ xwe li pêşberî civata nûjen dirifide (têk dije) û nikare ji qels û kawekîtiya xwe hev du bigire. Wisan ji Ebbas Mahmûd Al-Eqad, Mohamed Seyid Nemedan. Al-Bûti, Mostefa Mahmûd, dixwazin mehrekî di navbera pêşveçûna civakî û xwedanyatiyê de çêkin. Lî, ev tiştê ha bêçare ye. Ji ber ku mêtû li pey mêtîjîyê têkiliyêñ aborî xwe nadixe.

Layê sêyem: Konevaniya navniştîmani xwe bi rengekî awarte diyar dike, çîma?

USA li angora vekolinêñ Kovara Le Monde Diplomatique dê agir di herêmîn terdayî de vemirîne, lê di bin mercen ku havîl û südeyên wê pêk bînin. Ev tiştê ha xweş diyar e li Yugoslaviya be-

rê û li Rojhilata Navîn.

Fransa, pirtir ji Britaniya ya mezin dixwaze roleke taybet di civata cihani de bilize, lewma (Jak Sirak) Serokomarê Fransayê, li angora Kovara Le Figaro hêj çend roj li Elizê nebuhartibûn, di hilbijartina serokatiyê ya duwemîn de dirame. Lî, di baweriya min de ne Britaniya ya Mezin û ne Fransa dê tu astenga ji USA'yê re neafirînin.

Yaban (Japon): Ji ber pêşketina alavîn elektronî li pêşberî USA'yê radîweste û roleke girîng ji xwe re amade dike. Her wiha ew naxwaze, bi USA'yê re bikeve nava astengêñ konevanî.

Almanya, di warê elektronî de hevalreyê Japonya ye. Lî bi lez xwe jê cuda dike, ji ber ku xwe ji Fransayê dûr nabîne. Ev jî, di baweriya min de, li du engîzan vedigere: Ê yekem: Almanya hêj xwe ji nazîzma nû rizgar nekiriye.

Ê duwem: Saweke (tirs) konevanî li nik wê peyda dibe.

Rûsyâ teví ku komunîst bû jî dîsa li Domayê vegeryan, lê ev ne nişaneyî tiştekî mezin e, ji ber ku hêj civata ürisi rûnenistiye

û tu nihêrtinê mandî û bingehî ne xwe avakirine û ne peyda bûne.

Partiyên komunîst an ên nîv komunîst, iro li hawirdora maoîzmê, an stalînizmê, xwe germ dikan, lê mixabin, ew şâşiyê Partiya Komunîst ya Sovyetî bi şâşiyê herî dijwartir dişon. Lê mixabin, berberî van aloziyê konevanî, hişmendiya konevanî di mêjiyê civata kurdî ya politîkî de xweşik nemeyaye. Ew jî, bi taybetî li zingara ku du hezar sal li ser mêjiyê kurdan kom bûye, vedigere.

Layê çarem; Pêwendiyê çekdarî roj bi roj, cihê xwe ji pêwendiyê aborî re dihêle û berdide. Vê nihêrtina ha, di van sê-çar salêñ dawî de cihekî pak wergirt. Nemaze gotareke fireh di kovara Timesê de li ser naveroka vê babê rawestiyaye. Hem verêj, bi vekollînê xurt, mîna (Nikyalya yên mezin), (xêzên aso—Jak Etalî) bi pakciwanî, vê mijarê şîrove dikan (rave dikan) û encameke wisa giranbuha radiğihîn. Yekîtiya Sovyetê yê berê, USA'ye ji cihê xwe yê pêşin dakevin cihê duwemîn, ji ber ku dê Yaban û Almanya bi xurtiya pêşveçûna elektronîkî di cihê pêşin de vegirin.

Layê pêncem; Zanyariya diwarojê (Science-fiction) şerê alavî, mendalê şûşeyî û endaziya dûmehî, û hwd. dê roleke taybet û rizgarnameye bi şûn-

**Bazara Rojhilata Navîn, bêyi ava Kurdistanê, dê bi ser nekeve. Ji lewre bêdilniyaziya bazara Rojhilata Navîn dê cihê xwe venegire heman projeyê din ku cihê xwe berê vegirtibin. Yek ji van projeyan ava Kurdisanê ye. Der barê van layan de mixabin civatzanîna miletê kurdî beramberî vê qonaxa herî girîng zef li paş e.**

karî bilîzin.

Layê şeşem; Nihêrtina navniştimanî, her bi her, du naverokê hêja di hundirê xwe de diyar û zelal dike.

A yekem: Herêma kurdî, bi angoyeke taybetî û bî şeweyekî serbixwe, xwe ji Rojhilata Navîn cuda dike. Wihanî, di mêjiyê konevanî beyanî de roleke ji xweyî dilîze û wisa jê re pîgiraniyeke mezin, di pişt hêwanîn cihanî de heye. Ne bes e, hêj giranbuhatir, herêma kurdî di konevaniya navniştimanî de rîpîvanê lêhafî û angoyen xweberî dixwaze.

A duwem: Agahdariya rehî konevanî sînorê niştimanî derbas nake û xwe li wî dipêce. Anglo, sîtila agahdariyê ji warêneteweyî dimêje û pê re duwatiyeke yekgîrtî çêdike.

Layê heftem; Bazara Rojhilata Navîn, bêyi ava Kurdistanê, dê bi ser ne-

keve. Ji lewre bêdilniyaziya bazara Rojhilata Navîn dê cihê xwe venegire heman projeyê din ku cihê xwe berê vegirtibin. Yek ji van projeyan ava Kurdisanê ye.

Der barê van layan de mixabin civatzanîna miletê kurdî beramberî vê qonaxa herî girîng zaf li paş e. Engîzîn vê paşmayiyê gelek in. Lê bi bâwerî engîza herî mezin du milî ye:

Xwedanya, li nik civata kurdî di qaşilan de vege riwaye û naveroka hemû babetên sereyî û bingehî li angora vê nûyatiya xwe erzan dike. Ji lew re kurdan, ji bo avakirina mîjî, tu havîl jê wernegirtine. Ne bes e, wiha, hêj dijwartir em pîrtir ji babetên hişmendiyê û biryariyê dûr ketine.

Aborîzanîn û pêwendiyê aborî heriftî û vemirtî ne. Ev pêwendiyê beravâtî û fitiqandî, bi awayekî û şeweyekî xavalozî xwe diparêzin.

Berberî van dîtinê babetî, pirsêñ girîng têne kirin.

Gelo berpirsêñ konevanî dikarin berjeweniya navniştimanî û ya Kurdistanî bi ser hev du de bînin? Çi ga-vêñ bingehîn jê re amade kirine?

Gelo Rewşenbirê Kurdistanê nêzahî li ramana navniştimanî dikin? Dîsa ew mîna rewşenbirê cihanî xwe pak diwestînin, bi kêmanî xwe bi ke-viyêñ ramana navniştimanî bigirin.

Gelo rexnevan dikarin nêzahî li Dr. Sadiq Celal, Al Ezîm bikin? An bi kêmanî mîna Fatima Al-Mennîsi ronahi-yekê berdin ser kelepore xwe? Fatima Al-Nermîsi dixwaze gelek bistan der bike, ji lewre ew dibêje:

"Di sala ku pêxember çûye dilovanî Yezdan de, neh jin li pey mane, yek ji wan jinan bi navê Ayîse ye û temenê wê hêjdeh sal e."

Pêxember roja duşemê çûye dilovanî Yezdan. Lê çarşembê bi şey, ew xistine goristanê. Çimkî, Ümer û Ebû Bekir, bi planê konevanî yên di navbera mûhaciran û ensaran de mijûl bûn."

**HEYBET BAVÊ HELPÇE/ QAMİŞLO**

## Xulam

OSMAN ÖZÇELİK



**E**z çûmpêhatkubêhatewnehatne-hatawêbihatahatlomanehat" Xulam, bi hilmeke ji axayê xwe re wiha got û destê wî yê rastê li ser yê çepê li pêşîya wî girêdayî, pişta wî piçekî xûz, girdikên milên wî ber bi hundir, çavêñ wî ziq li çavêñ axê, wilo rawestiya.

Axê jê re got: "Baş e."

Çavêñ xulêm çûrisîn. Axayê wî jê fehm kîribû. Kêfxweşiyek li ser rûyê wî yê bi rih û fena çermê gayekî hişk, belav bû. Bi gavêñ nerm û hêdî berepaşkî çû. Lingêñ wî yên xwas û terikî sola wî ya şimikî bi xwe re kaş kir, derket derve. Li ber derî li hêviya işaret û fermanek axê rawestiya. Guhêñ wî li dengê axê bû.

Axe li odaya gund bi mîvanîn xwe re rûniştibû. Fexra xwe bi xwe anî ku ew xwediyê xulamekî wisa zana û têgihiştiye. Li herêmê xulamê kîjan axayî dikarî peyv û gotin wilo li nav hev du bixistana û wisa bi şîfre biaxifiya ku ji bilî axayê wî, tu kes jê fêm neke.

Vê rewşê bala mîvanekî kişand.

Ew axayê gundekî cîran bû û destbirakî axayê me bû. Axayê mîvan xwe negirt pîrsî "Bi qedrê Xwedê bikî, xulam ji te re çi got?"

Fersenda pesnê xulam ketibû destê axê. Pesnê xulam, pesnê xwe bi xwe bû. Rabû ji destbirakê xwe re şîfre ferisand, şîrove kir. Û got: "Jinek gavanê min heye ku, Xwedayê zulcelal, rebê alemê xweşîkbûnek, pakbûn û bedewbûnek daye ku li tu kesî tune. Ji çend rojan carekê ez dişînim pê wê ku werê em bi hevdu re kîf û henekan bikin. Îro min dîsa şandibû pê wê ku were. Xulam ji min re got: "Ez çûm pê, hat kû bê (xwest ku were), hat ew nehat (mîrê wê hatiye), nehata wê bihata (kû mîrik nehatibûya wê jînik bihata), hat loma nehat."

Axayê destbirak ji erzbihurtinê dest dîniye ser xulam û gotiye bi navê Xwedê ezê vî xulamî ji xwe re bibim. Û tu ji min çi dixwazî bixwaze,

Axe, beg û mîrên kurdan li ber deriyê xwe gelek xulam xwedî dikirin. Xulamê herî jîr, zana û pispor; yê herî bi îp û rîp; yê herî bi fen û fût dibû serxulam. Sergulamtî mîna paye û nîşanek girîng bû. Serxulamtî bi destê her kesî nediket. Ê ku dibû serxulam, istixbarat û hewadîşen hemû êl û eşîrê dihat ber destê wî. Kê li ku, bi kê re, çi çax, çîma çi gotiye; çi kiriye dihat ber

guhêñ serxulam. Serxulam li gorî berjewendiyê xwe û yên xwediyê xwe agahiyê ku kom kirine li bêjingê dixist, paşê li mîlê dixist û berba dikir. Agahiyê pûç bi ber bê diçûn. Yên mayî şîrove dikir û axe agahdar dikir. Bi vî awayî serxulam her çiqas xulam bûya jî, şêwîrmendî û aqîldaniya xwediyê xwe dikir. Ji bo ku qenc bikeve çavê xwediyê xwe tu daxwazîn wî bi şûn de venedigerandin. Digel qewadiyê, keç û bûkêñ xwe jî pêşkêşî axa, beg û mîr dikirin.

Pêşveçûn, teknolojî, perwerdehiyê û ya herî xurt têkoşîna neteweyî, şerê azadiyê rabûn û rûniştina civatê, dan û standina nav mirovan guhartiye. Îro axa beg û mîr nemane. Yên mayî jî bêhêz ketine.

Axa, beg û mîr ên me nemane, lê belê şûna wan vala nemaye. Êdî li şûna axê; qaymeqam an serbazên leşkeran hene. Li şûna began; walî û li şûna mîr û mîrekan ji; rêverberên dewleta navendî ya kolonyalîst hene.

Lê xulamok, xulam û serxulam? Ew her tim hebûn û wê hebin. Duh ji şaxa û beg û mîran re, îro ji serbaz û walî û wezîran re xulam in. Di nav wan de ji bo serxulamîyê pêşbaziyeke dijwar dimeşe. Yê herî xwefiroş û yê herî destmalgir dibe serxulam.

# Agirî bêxwedî nema

Xwîna ku li Agiriyê hate rijandin, niha ku'lîkê azadiyê li ser şîn dibin. Agirî berê xwîn digiriya, lê belê iro şervanê Welatê Rojê li ser, dîlana serxwebûnê digirin. Tola şehîdên me tê girtin. Bila ew di gora xwe de rehet razên.

**D**i dîroka hemû gelan de mirovîn leheng, qehremân û gernas hene. Ev şexsiyet di rojîn giran de ji gelan re bûne hêvî, pêşeng, çira û fermandar. Gelê kurd jî di nav xwe de gelek şexsiyetê serbilind derxistine. Ji van yek jî Îhsan Nûrî ye.

Îhsan Nûrî di sala 1893'yan de li bajarê Kurdistan ê herî kevn, li Bîlsê hate dinê. Malbata Îhsan Nûrî di heremê de bi welatparêziya xwe tê nasîn. Ji bo vê yekê jî navbera wan û osmanîyan her tim xerab bûye. Bi piranî berjewendiyê eşîretî û mîrîtiyê li pêş bûne. Malbata Îhsan Nûrî dewlemed bûye, di nav Eşîra Cibrâ de sereke bûye.

Îhsan Nûrî piştî xwendina dibistana ewil (seretayî), demekê çûye medresê. Li vir, bi ramana weletparêzî hesiyaye, vê yekê li ser şexsiyatâ wî gelek tesîr kiriye. Li gorî kesen ku wî ji nêzîk ve nas dîkin, daxwaza Îhsan Nûrî xwendina dibistana leşkeriyê bû. Di xeyalê wî de leşkerî hebû. Bavê wî ji bo ku li Bîlsê "Mekteba Ruştiye" (îlse) tunebû, ew şand Erzinganê. Îhsan Nûrî mekteba xwe bi serkeftinî qedand.

Armanca Îhsan Nûrî ew bû ku bibe fermandarekî mezin. Pereyên ku bavê wî jê re dişandin hemû didanîli ser pirtûkîn leşkerî. Wexta vedi-geriya malê jî lêkolîn dikir, roj û şevê xwe bi van derbas dikir. Dîroka kurdan hîn dibû, sedema têkçûna serhildana sedsala 19'an, xusûsiyetê gelê kurd ên leşkeriyê û qehremantiyê hîn dibe. Şervanên Kurdistanê wî serbilind û dîlxweş dîkin. Di xewn û xeyala xwe de arteşa kurdan dibîne û xwe jî wekî serleşker dibîne.

Îhsan Nûrî hîn di bîst saliya xwe de bûbû fermandarekî jîr. Ji hêla zanebûna leşkerî ve xwedî cîhekî xuyayı ye. Li ser şerî gelek konferans didan, gotar dinivîsin, gotûbêj û nirxandinê balkêş dikirin. Di şerî cihana yekemîn de têkîl bi cemiyete Tealî ya Kurdistanê re datîne. Di vê demê de politikayê Osmaniyan dibîne. Zîlm û zora ku li gel tê kîrin, qebûl nahe. Li hemberî vê zîlmê derdikeye. Di vê demê de xebata wî hemû ji bo xelasbûna welat e. Lewre bi serbazên ku ji

bo azadkirina Kurdistanê ji leşkeriya Osmaniyan reviyane re dikeve têkiliyê. Ji bo sazikirina rêtixinekê dest bi çalakiyan dike. Bi Xalit Begê Cibrî re li Erzoromê rêtixina Azadî ava dîkin. Dema ku Osmanî bi vê yekê dihesin wî derdixin dîwana herbê, tiştek nayê tesbîtkirin, tê berdan. Di gel vê yekê şik li ser dimîne.

Îhsan Nûrî dema gelşa Mûsul ji nû ve derdikeve meydanê, derbasî Amedê dibe û tê ser yekîneyê li Bişîriyê. Di vê demê de bi serbaz û pêşengên kurdan re têkiliyê datîne û li Elkê (Beytuşebab) serhildana ewil li dar dixin. Ew serhildan têk dike, ji serokê serhildanê gelek tê girtin û şehîd dikevin. Îhsan Nûrî bi hînek hevalê xwe ve derbasî Başûrê Biçûk dibe. Li vir jî diçe rojhîlatê Kurdistanê. Li vir bi têkçûna serhildana Şêx Seîd dihesin, Dixwazîn alîkariya serhildanê-bikin, hazırliyen wan vala diçin. Bêhna Îhsan Nûrî gelek teng û hêrs dibe.

Dijmin xeberê distîne ku ew li Şemzînan e, ji bo girtina wî êrişike mezin dîkin, lê ew zû de derbasî Îranê bûye. Dereng mayîna wî, ji wî re dibe kul û keder. Xwe tawanbar dibîne ku çima negîhîstiye alîkariya serhildanê. Dewleta tîrk bi hezaran kurd kuştin, koçber kîrin, bi sedan gund şewitandin. Serokê serhildanê Şêx Seîd û tevî 47 leheng bi dar ve kîrin.

Şervanên ku sax filîtin berê xwe dan çiyayê Kurdistanê yên serbilind. Çiyayê muqedes dîsa hembêza xwe ji zarokên xwe re vedikirin û ew diparastin.

Di sala 1926'an de Biro Hesko li Çiyayê Agirî li dijî dewleta tîrk dest bi serhildanê dike. Hînek pêşmerge û serokê kurdan ên ku derketibûn derveyî welêt jî di roja 5.10.1927'an de rêtixina Xoybûn damezîrandin. Xoybûnê Îhsan Nûrî kir bêpîrsê leşkerî û bi hêzeke mezin ji bo alîkariya Biro Hesko Têlî şand çiyayê Agirî.

Ciyayê Agirî warê şervan, mîrxas û qehremanan, cihê parastina şeref û namûsê. Agirî niha navendîya berxwedan û serhildana kurdan dike. Bingeha Artesa Kurdistanê li vir dihat avêtin.

Îhsan Nûrî bi rutbeşa paşatiya

serokê artêşê hatîye Agirî. Hêzên kurdan belawela û bê rîk û pêk in. Lewre peywîra Îhsan Nûrî zor û zahmet e. Lî belê bîr û baweriya wî xurt bû. Ji bo Kurdistanê azad û serbixwe ji ji tu fedekariyê, xwe nedida paş. Di hêla zanebûn, tecrûbe û serleskeriyê de sereke bû. Di hêla taktîk û stratejiya şer de xwediyê ramaneke kûr bû. Ji ciwantiya xwe heta wê rojê di nava şer de piijiyabû. Di demeke kin de şervanê kurdan li gorî rêtixina artêşê saz dike. Hêzên kurdan ên çekdar ji deh hezarî bêhtir dibin.

Îhsan Nûrî di hêla helbest û edebiyatê de jî xwedî zanebûn û hesteke tenik bû. Hest û dilgermiya xwe di Marşâ Agirî ku her sibe Artêşa Kurd pê erd û ezman dihejînin de wiha tîne ziman.

*Agirî Agirî tu agir bû  
Nav dinyayê serbilind bû  
Li ser Kurdistan tu çira bû  
Hilbe Agirî hilbe Agirî  
Rast e berê agir tu bû  
îro agir lawê te bû  
Ser sînga te sî girtiye  
Hilbe Agirî hilbe Agirî*

Îhsan Nûrî wexta bi leşkerê xwe re merşê dibîje, bilindiya serê wî digihêje erşan. Hewar û gaziya wî li çar goşeyê welat belav dibe.

Hikûmeta Tîrkiyê dixwaze bi Îhsan Nûrî re peymaneke şer rawestandinê çêbike her wiha li ser tîxûbê Îran û Tîrkiyê hevdîtinek çêdibe, Îhsan Nûrî dibîje: "Ez komutanê Xoybûnê me heke hûn dixwazîn peymanekî çêbikin, divê hûn herin bi Xoybûnê re çêbikin."

Piştî sê çar salan şerî de navbera hêzên tîrk û kurdan de dijwartîr bû. Îhsan Nûrî ji bo ku hîzî Artesa Tîrk ji hev belav bike, bi teqtîkî li gelyê Zîlan jî eniya şer vekir. Dewleta tîrk êdî nikaribû pêşiyê li serhildanê bigire. Carekê din dest bi planêxwe yên kevnare kir. Bi dewleta Îranê re dest bi guftûgoyan kir. Tîrk û farisan li ser guhartina tîxûb li hev kîrin. Tîrkiyê parçeyek ji rojhîlatê bajarê Bazîdê û İranê û di şûna wê de jî Agiriyê biçûk ji Îranê girt. Her wiha her du çiyayê Agirî jî ketin desten Tîrkiyê. Wê ji çar aliyan ve derûdora hikûmeta Agirî girt.

Riyêñ alîkarî û pişgiriyê jê hatin standin. Têkiliyên kurdan ji



Îhsan Nûrî paşa û pîreka wî Yaşar Xanîm

dinyayê qut kîrin. Xwestin ku serhildanê bi vî awayî vemirîni.

Li ser Îhsan Nûrî kîncen germ ên leşkerî, li ser sînga wî jî, ji her du milan du rest bi awayekî çeprästî hatîye pêçandin. Li piştî jî cewdikeke çerm û tê de tebancayeke sûr. Li her cihî, bi her awayî ev şiklê dijwariya şer nîşan didan. Bejn û bala wî dirêj, bi

heybet li qermîçokên eniya wî tecrûbeyen salan bawerî dide dora xwe. Dawiya payiza 1929'an, destpêka zivistanê, quntarên çiyayê Agirî di nav berf û bahozê de nalîna çiyayê sermij wekî nalîna Kurdistanê, sar û sema, pûk heye, rê hatine girtin, hatin û çûyin kêm bûye. Hikûmeta Agiriyê, di bin van hoyen gelekî dijwar de bi mîrxaşî heta sala 1931'ê li ber xwe da. Xwarin û cebîlxaneyê hêzên kurd qedian. Hezîn kurd bi serokê xwe re xwe nedan dest. Di dawiyê de, çeperên şer hatin şikandin û derbasî Îranê bûn.

Di salên 1926 û 1931'ê, şes salan di serhildanê Kurdistan de berxwedana herî dirêj kumandan Îhsan Nûrî bi têkçûna serhildanê çû Îranê û li wir bí cih bû. Di dawiya temenê xwe de bû koçber. Di dîroka kurdan de cihê Îhsan Nûrî Paşa balkêş e.

Mirovekî cîwanmerd, fêris, qedirîgir û serleskerê pehlewan.

Rewşenbîrekî zane. Helbestvanekî hestiyar. Berhemâ wî ya bi navê "Ağrı Dağı İsyani" bi kurdî hatîye nîşan. Di kovaran de jî gelek nîşan wî hene. Di dawiya emrê xwe de ji bo doza Kurdistanê bîdilsozî mesiya.

Îhsan Nûrî Paşa di 18'ê adara 1976'an de li Tehranê li ber deriyê mala xwe dikeve bin motosikletekî û birîndar dibe. Di 25'e adarê de diçe ser dilovaniya xwe.

Gora wî li Tehranê li Goristana Behşetê Zehrayê ye.

Xwîna ku li Agiriyê hate rijandin, niha ku'lîkê azadiyê li ser şîn dibin. Agirî berê xwîn digiriya, lê belê iro şervanê Welatê Rojê, li ser dîlana serxwebûnê digirin. Tola şehîdên me tê girtin. Bila ew di gora xwe de rehet razên. Warê derketin û rabûna mirovahîyê, dîsa wekî rêtixina medya hemdem pêşengiyê ji mirovahîyê re dike. Gelê kurd di bin pêşengiyâ Tevgera Azadiyê de ber bi welatekî serbixwe û azad dimeşe.

CEVDET DEMIROĞLU



## ● 18.08.1992

Dewleta tirk bi hezaran leşker û polisên xwe ve, li Şırnexê komployek li dar xist. Du şev û du rojan bajar hate gulebarankirin û bombebarankirin. Bi dehan kes hatin qetilkirin, bi hezaran kes jî koç kiran.

## ● 18.08.1850

Balzac çû ser dilovaniya xwe.

## ● 20.08.1982

Konferansa Duyemîn a Partiya Karkerêne Kurdistan PKK'ê li

Bekaayê hate lidarxistin.

## ● 20.08.1993

Endamê Partiya Demokrasiyê (DEP) Musa Ak ji hêla kontrayan ve hate qetilkirin.

## ● 22.08.1985


Şâur Turgut Uyar çû ser dilovaniya xwe.

## ● 22.08.1993

Welaþparêzê kurd Abdullah Yüzen li Erxaniya Amedê ji hêla kesen tarf ve hate qetilkirin.

## AWIR

# Li Enqereyê çalakiya çanda kurdi



Mele Abdullah Varlı

Hemû  
xebatêvê  
çalakiyê ji  
aliyê  
Ciwanê  
HADEP'a  
Altındağê ve  
hatibû  
amadekirin.

**R**oja 07.08.1997'an li HADEP'a Altındağê ku girêdayî Enqereyê ye ji aliyê Komîsyona Ciwanan ve çalakiyek bi sernavê "Windabûna Çanda Me" hate lidarxistin.

Di vê çalakiyê de mîvanî herî girîng Mele Abdullah Varlı bû. Bi tiştîn toreyî ve tak û diwar û cihê rûniştinê hatibûn xemilandin, lewre ji bêhna Kurdistanê jê dihat.

Çalaki ji aliyê serokê komîsyona ciwanan ve hate vekirin. Serokê komîsyonê di gotinê xwe yên vekirinê de li ser armanca vê çalakiyê û girîngiye wê rawestiya.

Pasê serokê komîsyonê rîza vegotinê da Abdullah Varlı. Abdullah Varlı di ahaftina xwe de ji 1500 sal (BZ) heta niha ji aliyê dîrokî ve li ser çanda kurdi sekinî. Pişti vegotina Abdullah Varlı serokê civînê rîz da mîvanan. Gelek mîvanan dîtinê xwe yên der heqê çanda kurdi û windabûna wê de hûr û kûr anîn ziman.

Di van gotinan hemûçkan de giranî li ser windabûna zimanê kurdi û nepeyivîna wê di nav gel de bû. Li ser vê yekê de mîvanekî serboriyeke xwe anîn ziman.

Mîhvan got: "Ez rojekê cûm ba mevêtekî xwe li wir tiştî herî zehf bala min kışand, nepeyivîna zimanê kurdi ya zarokên malê bû. Min mîze kir dê û bav di navbera xwe de bi kurdi dipeyivin, lê belê gava bi zarokên xwe re dipeyivin? bi zimanê tirkî dipeyivin. Çawa min wisa dît ez gelekî pê xengîn bûm."

Bi vî awayî hemû mîvanan din ji li ser zimanê kurdi dîtinê xwe anîn ziman. Li ser zimanê kurdi ji Abdullah

Varlı daxwazek ji gel kir, ku qetnebe zimanê bi kurdi winda nebe û bi pêş ve here got: "Pêwist e ku hemû di mala xwe de bi zarokên xwe re bi zimanê zikmaki (maderî) yanî zimanê kurdi bipeyivin. Çimkî gava zarok diçin dibistana û derdikevine nava kolanan ji xwe hînî zimanen biyan dibin.

Pişti ku vegotinê li ser rojevê qediyen Koma Zilan çend stranê xwe ji mîvanan re pêşkêş kirin. Paşê ji xwarin hat ber mîvanan, navê vê xwarinê "Serde sîr" bû. Ji ber ku ev xwarin, xwarineke kurdan a kevneşopî bû, mîvanan gelek hez ji vê xwarinê kir, di rex vê xwarinê de xoşav ji hebû.

Dor hat ser kurteşanoya (skeç) ku ji aliyê civîna ciwanan ve hatibû amadekirin navê wê "Realite" bû. Ev kurteşano ji ber ku li ser rojevê bû ji aliyê mîvanan ve gelek balkêş hat dîstin.

Pişti kurteşanoyê bername bi sohbetan hat domandin. Dûv re ji aliyê Ciwanan ve helbest hatin xwendin, disa mîvanan hatin besdari vê bernameyê bûn, bi stranê xwe yên gelêri mîvanan din gele kîfxweş kirin. Bi vî awayî çalakiyê ji 17.00'an heta 22.00'yan dom kir.


Hemû xebatêvê çalakiyê ji aliyê Ciwanan HADEP'a Altındağê ve hatibû amadekirin, bername gelek bi xweşî tî dilgesî derbas bû. Li gorî agahiyê ku komîsyona ciwanan dan, wê xebatêvê vî rengî bidomin.

AZAD JIYAN/ENQERE

## ÇAVDÊRÎ

MIRHEN YİĞİD


## Malbata dixwernedîtî û hin rêexistinê me



**S**erpêhaîî, bûye û qewimiye. Ketiye nav milet û di ode û dîwanxaneyên kurdan de tê gotin. Dibêjin li gundekî ji yên herêmeke Kurdistanê havîna dereng e, havîn qulupiye payizê. Xelkê cih û giş gundê der û cîran zad û dexlê xwe dirütine, bênderên xwe rakirine, kirine kewar û embaran. Zadê malekê maye. Em bibêjin mala derengketiyan yan ji bêxem û sersaran. Małum e zadê li rastê ziyan lê dibin, pez û dewar dikevinê. Her êvar zaroyên malê hevdu dişidînîn, qerara xwe dikin yek û "sibe em dê herin ser genim, em dê paleya xwe bikin", dibêjin. Sibehê her kes dereng radibe. Yek ji vî û yek ji yê din hevdû dibin ser erd. Têr ser erd, belê ka yê ku dirûnê bike û das û qeynaxên xwe têxe kar? Li dora zad diçin û têr, yek dibêje: Em ji bakur dest pê bikin. Yê din na dibêje: Berê zad li rojava ye, em têkevin pey û pişta xwe bidin bakur dê bikeystir be. Yek dibêje em bi tatîkî (tarîk), lê bidin, yê duhem na dibêje: Bi dîtina min divê em bi hedran herinê. Yek sêhem doza çinîna ber bi ber dike û ev kar ji bi sermelik dibe dibêje. Munaqeşe dirêj dike, roj hildikse û tay dijwartir dibe. Belê zad di cihê xwe û ye û hê kesekî ne gurzek, lê tayek genim ji neçiniye. Paleyên me aciz dibin, germahî li serê wan dide, bêriya ber sihê dibin.

Mezinê wan vê zane û pale ji hev agahdar in. Haya wan ji hev heye û giş bi ya dilê hev zanin. Kes ne hevalbendê çinînê ye. Dawî semyan û mezinê wan pêşniyazekê bi dilê herkesi dike. Pêşniyaz lipaşxistina dirûnê ye. Vê dibêje: Hün dibînîn îro dereng bû. Va roj hate nîvî ezmên, bêj hema nîvî rojê çû. Ya baş ew e ku em îro vegeerin malê û sibe zû bi zeraqa tavê re em bê. Hün ci dibêjin, ne baştı e? Herkes bi dengêkî belê dibêje û paleyên me bi şûn de vedigerin gund. Bi vî awayî roj, heftê û meh derbas dibin. Paleyên me têr ser erd, lê çawa têr ji, pişti devjeneke bêkedi wiha ji vedigerin. Zad ji bi erdê dê diçice û pez û sewalênd gund tê de diçêrin. Tu nabê kiroşkeke û çêlikên kiroşkê ditirsin ku hêlinâ wan xerab bibe û li ber piyan herin. Kiroşka bi tecrûbe ku xwedîyê erd nas dike, dilqewînyê dîde zarokên xwe. Na lawo metîrsin, ez vê malbatê nas dikim, ez zanim çend mû li qûna wan in. Her sal karê wan ev e. Hün guh nedîn gotinê wan, ew ne îro û ne ji sibe tiştekî nakin. Derew e û vir e her tiştê wan.

Roja çêdan e em nizanin. Belê heftê û meh bi vî awayî derbas dibin. Qismek ji genim dibe alif û çêri diçice, hînek dibe pişka ba û bahozan, hicac û bablîsok bi xwe re dibin û yê mayî ji diweşe. Em serê hev neşînin ji çaran sisîyê genim nehîm dibe û yê heye ji dimîne sap û qesela vala, pûş û pelaxê bê dan. Jixwe neticeya ku malbatâ xwedîjîstîndiyan ji li bendê ye ev e. Û malbat gotina dawî dike: Ev genim êdi hew hêjayed çinînê ye, tiştekî em biçînî nemaye. Ya baş em agirekî berdinê û bila here. Bila bibe ziblê zadê saleke din. Héta saleke din ji Xwedê kerîm e, mezin û xefûr e. Çêlikên kiroşkê çarçav dibin. Li diya xwe dinîrin, ka îcar wê ci bêje. Kiroşka dê bersîva ku çêlikên wê meraq dikin, dide: Ev rast e, îcar em ji xwe re li cîhekî bigerin. Rewşa piraniya rêexistinê me ji mîna rewşa vê malbatâ derengmayî û tirale ye. Wan ji Xwedê li wan xistiye û Xwedê ji wan standiye. Ew ji karê ku îro gerek bê kirin, tim li paş dixin. Ji bo her hawil û gava neteweyî, "Hê ne wext e", dibêjin û texîrkirina kar kirine felsefe û siyaset ji bo xwe. Baş e ku pekeke çêbûye û serokê mîna Apo heye îro. Yan na van rêexistin dê rewşa me ji ya vê malbatâ bûye dabaşa sohbet û meclîsîn kurdan û bûye nimûneya tiraletiyê, nekirkêri û jiyanâ li derveyî zemên, hê ji xerabtir bikirana.



**R**omana erebî gavine girîng avêtime. Hetanî ku çend romanîvîsên ereb bala cîhanê bi tevayî kişandine. Minak; Necîb Mehfûz xelata Nobelê qezenc kir (1988). Tu ci cihî didî romana erebî di nexşeya romanê de li cîhanê ?

Ez nizanim romana erebî, ji sedî sed, cihê wê li ku ye di warê romanê de li cîhanê, ji ber ku ez bi tu zimanê biyanî nizanim, hetanî ku ez rewşa romanê li cîhanê bi tevayî nas bikim û ev nîsîn wergerandî, di nerîna min de nikarin wêneyê rastiyê bînin ber çavan, çimkî tu mane rasterê nîn e di hilbijartina van romanên wergerandî de û rastiya rewşa romanê sal bi sal nayê ber destê me.

Carinan xelatên cîhanê wekî Nobel bala mirov dikişinin, bi aliye hinek nîsîkarên ku em tu tiştî li ser wan nizanî, lê em têdîgîhejin ku em bi rastû navine mezin in, wekî Tonî Morison a ku xelata Nobel, ew ji me re pêşkêş kir. Teví wilo û li gorî ku wergerandin rewşê şirove dike, mirov dikare bêje, romana erebî li pêş e. Çend nav hene berhemên wan dikarin romanê li cîhanê zengîtir bikin. Wekî Edward Elxerat (Misir), İlyas Xûnîs (Libnan), Brahim Eslan (Misir), Selîm Berekat (Sûriye) û geleb navêni ûn ku di salen bê de bale bilişmin bi aliye afirandinê xwe de.

Ji Sûriyeyê kêm nav di romanê de hebûn ku cihê xwe yê bilind standin.

Wekî Henna Mîna û Hanî Elrahîb. Lê di vê dema dawî de bi derengî, romanê xwe da pêş û niha nav pir in di vê pêvajoyê de, hûn vê dîtinê, vê rewşê çawa dinirxînin?

Li Sûriyeyê romanê cihê xwe ji mîj ve standiye. Lê belê ne li Sûriyeyê tenê, li hemû welatên erebî dijayedî, dijiminayî, ne di nav celebêne toreyî de bû, aango ne di navbera roman û helbest û sanoyê de bû. Na, dijayedî di navbera

Mirov dikare bêje, romana erebî li pêş e û qendi nav hene berhemên wan dikarin romanê li cîhanê zengîtir bikin. Wekî Edward Elxerat (Misir), İlyas Xûnîs (Libnan), Brahim Eslan (Misir), Selîm Berekat (Sûriye) û geleb navêni ûn ku di salen bê de bale bilişmin bi aliye afirandinê xwe de.

du formên toreyî de bû.

Di navbera toreya îdeoloji ku hemû partî di kar de jê re piştgir bûn ev toreya ku radihist armanc, doz û ramânên wan, wan jî ev dida pêş. Vê yekî hişt ku îdeoloji ne têkeve romanê tenê, lê belê têkeve hundîrê tore û çandê, bi tevayî dixwestin ku ev toreya îdeoloji, xelk li ser wê xwedî bibin. Li hêla din toreya li ber siyê ya ku ji bişî afirandin û xeyalê, tu tiştî hêja nabîne di nav teqereqa propaganda û îdeolojiyan de afirandin winda bû. Dengen ku bilind bûn

# D omannivîsê ewşenbûr dîl sagîtiyen

■ Xalid Xelîfê, navekî balkêş e di warê romana nû de Xalid di sala 1964'an de li Helebê ji dayik bûye. Sala Yek ji damezrînerên kovara "Elêf" ya nîsîndina nûjen çapkirî; "Pasvana Xapandinê" ye. Ev romana wî di roman in, "Defterên Qereçîyan, Dîla Gumanê."

■ Li Helebê, pişti germbûna ku pirsgirêka kurdi hembi guftûgo li dar dikevin; li ser vê mijarê û hinek probleme Xalid Xelîfê re pêk hat.

tu têkiliya wan bi toreyê re tune bû. Niha em dibînin ku rewş xweştir xuya-ye û afirandin. bi pêş de, ber bi cihê xwe yê rast ve diçe. Siwarênu duh û pêr peya dîbin. Romana iro nirxê wê di hundîrê wê de ye. Di hundîrê nîsîkarê wê de ye, nîzmbûn û bilîndbûn di nîsîsarê bi xwe de ye, dûrî sistiya çîrokbehêjîn kevnare û xirte xirta îdeolojiyan ketiye.

Wekî romanîvîsekî ereb, hûn romanên Selîm Berekat çawa dinirxînin, ne ji hêla teknîkî tenê ve, lê belê ji vê hêlê de jî ku ew nîsîkarekî kurd e û hemû berhemên xwe helbest û roman

nav lê bikim "nîsîndina surgûniyê" û pêşniyazeke min heye hetanî ku peyvîn li ser Selîm Berekat ne bilez û bê wate bîmînin. Ku bê nîşandan wekî nîsîkarekî surgûnê û projeya pirtûkekê amade bibe da ku ev tevda dîtinê xwe di nîsîsarê Selîm Berekat de bînin zîmîn... Ev tîştekî biçûcik e ji tiştîn ku mirov dikare pêşkêş bike ji romanîvîsekî herî giring re ji yên ku bi erebî dînîsînin.

Ne di romana erebî tenê de, belê di hemû berhemên hunerî û toreyî yên erebî de tu hebûn ji mirov kurd re nîn e. Yê ermenî, bi firehî şerkesî (çerkezi) tîrkî, farîsi, fransî û çînî jî tev de têr dîtin. Lê yê kurdi hetanî di quncikê mirî de jî nayê xuyakirin. Lê we di romana xwe (Pasvanê Xapandinê) de ev wêne şikand û miroveke xweşik û balkêş di romanê de cih girtiye, ew jî "jîna kurd e", hûnê li ser vê yekê ci bibêjin?

■ Min wêne neşikand, tu xweşzanî ku demeke dirêj ji jiyana bi xwe, min bi kurdan re qedandiye. Ci rewşenbûr bin, ci kesîn normal bin, gelek nîqaş di nav me de derketin, geh wekî hev û geh ji ne wekî hev em diramîyan. Lê kesî ji me yê din tune nedîkir. Her mîletê ku mirov pê re bijî, divê cihê xwe di jiyana mirov de bigire. Efrîn ji min re mîna xewnekê ye, ez bi tirs nêzîkê dibim ji bo afirandin û ceribandinê. Teví ku hiş û bîranînê Selîm Berekat hetanî niha dîlê xerakirina û kevn in, girîngîya nîsîsarê wî di warekî din de ye ku ez Efrîn a ku siya wê di romana min de be-

# Şîrî Xalid Xelîfê: nebe hevparê iyasetvanan

eyê. Navê wî bi nivîsarên nûjen ve hatiye girêdan. Fakulteya Hiqûqê li Zanîngeha Helebê kuta kiriye. etanî rawestandina kovarê 1994'an. Berhemên wî yên de li Beyrûdê hatiye weşandin; yên li ber çapê du

li ser rewşa têkiliyên rewşenbîrên kurd û ereb gelek li, ev hevpeyyîn bi rewşenbîr û nivîskarê ereb

lawela bû. Di baweriya min de mirov nikare qala Efrînê bike bêyi ku qala kur- dan bike û "jina kurd" a ku tu dibînî xweşik û balkêş wê cihê xwe yê vala dît di romanê de.


Ne ku min ew nivîsand, ji bo ku bê gotin min li ser kurdan nivîsand, geleq germayıya dema nivîsandinê rê nadîn min ku ez di tiştekî de bifikrim, ji bîlî vê tevgera nexuyayî ya kesên romanê yên ku destûra hebûna xwe ji min dixwazin. Tişte di pirsa te de mezintir e ji meseleya "jina kurd" a ku min di romanê de pêşkêş kiriye. Ev pirsa te mirov diajo ber bi tiştekî herî xetere de.

Tev de dixwazin em bibin nivîskari- ne bêrûmet; bêhtir ji me tê xwestin ku em bi şeweyê bazirganên siyasetê ramânê xwe bînin ziman. Tiştekî ne veşartî ye ku ez piştgirê doza gelê kurd im û ez pir guh didim rewşa wî ya fronyîn ï ya pêşerojî; ev pêşeroja ku ketîye nav rîçikên mij ï tariyê ku çiqasî dem bi we re hişk be ji, ez tim li deri- yê hevpeyyînê digerim, ez ji dil dixwazîm ku têkiliyên min bi rewşenbîrên kurd re û bi kurdên normal re ji hebin. Têkiliya bi siyasetkarên kurd re ne ew- qasî girîng e li cem min, çîmkî ez ji tu si- yasetkaran bawer nakim; ne kurd û ne ereb û ne ji amêrîki... gel û rewşenbîr, ew dilîn rastiyê yên zindî ne.

Rewşenbîrên ereb, tevî ku nêrinê wan cur bi cur in li ser pîrsîrêka kur- di, lê bi tevayî tekiliyên wan bi doza kurdî re qels e; di ser guhê xwe re dia-

vêjin, ji bîlî çend navê mîna Hadî Ele- lewi. Ew bi germayî piştgiriya gelên dûr dikin, lê tu carî xwe nadîn ber barê piştgiriya doza gelê ku di nav wan de dijîn, ligel vê diroka dirêj a ku bi hev re derbas kirine.

■ Ez ne di wê baweriye dê me ku têkiliyên rewşenbîrên ereb bi doza kurdî re qels in. Ev jihevdûrketina ku di warê siyasi de diyar e. Rewşenbîr jê nexweş in û ne bi erêkirina wan rewş hatiye çekirin. Ligel ku dengnekirinek heye di vê helwestê de, ev tiştên ku he- ne tevde; jihevdûrketin û tunebûna da-



nekirine. Ev jihevdûrxistin û qelsbûna nîqaş idêolojiyêni li dijî hev û berjewen- diyên siyasi yên teng anîne holê. Eger hevalbendiye hebe ji carinan, lê şewe- yekî taktilî distîne û bingehêk divê bê danîn ji têkiliyên hezarê salan re. Hin tê bîra min, geleq guftûgo li ser doza danûstandineke demokratik û azad derketin holê, lê min kes nedît ku kari- be van pêşniyazan bigihîne asteke şaris- tane û bi zanîstî bersiva demê bide. Em

**Tîştekî ne veşartî ye ku ez piştgirê doza gelê kurd im û ez pir guh didim rewşa wî ya fronyîn ï ya pêşerojî; ev pêşeroja ku ketîye nav rîçikên mij ï tariyê ku çiqasî dem bi we re hişk be ji, ez tim li deri- yê rîçikîn rîşqasî digerim, ez ji dil dixwazîm têkiliyên min bi rewşenbîrên kurd re û bi kurdên normal re ji hebin.**

nûstandinan ji, karê siyasetvanan e. Si- yasetvanan kurd ji hinekî berpîrsê vê rewşê ne, ev helwesten vê dawiyê yên di cenga Xelîc (Amerika û Iraq) de hîn li ber çav in ku ramânê wan li paş in û li ber pêwendiyên kurd û ereban bi ne- rîneke stratejîk nasekinin. Rewşenbîrên ereb bi xwe li ber piyan in û tu desthilatdarî û biryar di disten wan de tune ye. Ew bi xwe dilîn tenetî û dûr- xistinê ne ji rewşenbîrên her gelî bê- htir. Tevî wîlo ji rojekê ji rojan tu kes bi wan re nesekiniye û birînê wan sivik

navbera gelên ereb û kurd de şaxen xwe berdidin hundîre pêwendiyên çan- di û wêjeyî di navbera her du gelan de. Hün ne bi min re ne ku rewşa çandî di- vê taybetiya wê hebe û dûrî nexwesi- yên siyasetê bikeve. Wisa bêhtir em ni- vîskar ji nerînê xwe yên şaristanî û ji mirovayetiye re nêzîk nabin?

■ Erê, ez di wê baweriye de me ku wê çand û wêje me ji vê tevîheviye riz- gar bike. Tevî ku van "dirbekvanan" tu cihê hêja ji çand û wêje re nehiştine û dixwazin me fêr bikin karê çandî, çawa tê kirin û çawa divê em bixebeitin an dixwazin rola me ji me re rasim bikin, wêneyê li ber çav niha ne xweşik e û bi paşketin û tunekirin û terorîstiye dor- pêckiri ye. Ci di meydana çanda erebî de be, ci di warê çanda kurdî de be, ne bes e ku em bibêjin divê û divê... karê rast ew e ku li ser çand û tote û wêjeyî pîrsîn hevpeyyînê bi giranî rawestin û em li hemberî hemû projejîn kevne- perestan rabin. Ev erka her mirov rewşenbîr e. Rewşenbîr nikare şâşti- yênen kesen siyasi rast û durist bike, lê dikare nebe hevpar û aligire van şâştiyan.

Ev tevîheviye pêwendiyên siyasi di

HEVPEYYÎN: HELÎM YÜSIV /  
SÛRIYE

Parlamentera Keskan ya Almanyayê Amke Dieterd Scheuer:

# Trêna Aştiyê sînyalek e

Bêguman PKK'yî jî aştiyê dixwazin, ji wan re jî pêwist e. Hetanî dawiya emrê xwe nikarin vê meseleyê bi şer bidomînin û dewlet jî nikare zora wan bibe. Bi min heger hikûmeta Tirkiyeyê zagonên ku rê li ber mafênd kurdan ên çandî, azadiya derbirinê rake, her wiha ku OHAL, sîistema cerdevaniyê û binpêkirina mafênd mirovan ji holê rabin, wê bingeh ji aştiyeke domdar re çêbibe.

**X**ebateke wisa ji ku derket, ya Trêna Aştiyê hin tiştîn ku em nizanin hene an na?

● Belê berî ku ez bibim mebûs ez di nav rêxistina navneteweyî "AF"ê de jî xebitîm û ev bi salan e ku ez di nav xebata mafênd mirovan de me. Wekî din ez di nav parlamento ya Almanyayê de jî endamê Komîsiona Mafênd Mirovan im. Her wisa ev demek dirêj e ku ez bi taybetî li ser Tirkiyeyê xebatê dikim. Der bârê mafênd mirovan de.

Belê ji bo bicîkirina mafênd mirovan, aşti pêwist e. Digel ku li Tirkiyeyê şer nîn bûya û mafênd kurdan bi-hata nasîn me yê li cibekî din ev xebat kiribûna. Lî vêga ji bo kurdan ez dixwazim ku aşti li ser bingeha demokrasî û mafênd mirovan çêbibe.

Bi dîtina we, wê tesîra Trêna Aştiyê li Tirkiyeyê çêbibe?

● Heke ku beşdariyek zêde çêbibe, (ez hêvî dikim ku wê beşdariyek mezin bibe) wê bandora wê çêbibe. Ev sînyalek e hem ji bo gel, hem jî ji bo hikûmetê.

Li Tirkiyeyê tiştîkî din heye, tu carî der barê aştiyê de xebernadîn, ne siyasetmedar ne jî kesen ku dibêjin em demokrat in, li ber vê yekê raya giştî ya Ewrûpayê an jî derdorênu ku dibêjin em demokrat in, mafparêz in an jî saziyên sivil ci dibêjin tu reaksiyon heye an na?

Belê raya giştî ya Ewrûpayê, lê kesen ku bi vê meseleyê re eleqedar dibin difikirin û dibêjin: Divê li Tirkiyeyê inisîyatîfeke mafênd mirovan hebe di nav hikumetê de. Lî belê hûn jî dizanîn ku hikûmeta Almanya çekan difiroşe Tirkiyeyê. Di vê, derê de di merhaleya avakirina hikûmetê de û di têkiliyên di navbera hikûmetan de kêmasiyek mezin dibînim.

Çi Konseya Ewîpa, ci jî Rêxistina Hevkarî û Ewlehi ya Ewrûpayê û Koma Xebatê ya Konseya Nete-weyên Yekbûyi li hemberî Tirkiyeyê, bi taybetî jî li hemberî vî şeri gelekî sersar dimînin. Tu gavan navê-jin. Mesela Rêxistina Hevkarî û Ewlehi ya Ewrûpayê divê ku di vî warî de gelek tiştan bike, di warê aştiyê de lazim e ku inisîyatîfa xwe xurtir bike. Divê ku ev rêxistin vê yekê weki berpirsiyariyekê bibîne. Ew ci dike? Wisa dide xuyan ku ev mesele bi tenê Tirkiyeyê eleqedar dike. Belê li ser pişta wan berpirsiyekê



giran heye lê vê berpirsiyariya xwe bi cih nayînî.

Belê wekî ku hûn jî dizanîn van demen dawîn li hemû dînyayê qala aştiyê tê kirin. Bi Trêna Aştiyê ya Musa Anter jî, li Tirkiyeyê jî aliyê kesen muxalif ve, ev mijar hate rojevê, bi dîtina we aşti ci ye? Wexta ku aşti tê gotin ci tê bîra we?

● Aşti, aşti rewseke ku bê şer, cihê ku lê çek na-yen teqandin. Belê şer nîn e lê zordestiyek tundtirin çedîbe, ev ne aşti ye.

Ji bo aştiyê mafêjiyanê, hem jî mafêjiyanek azad divê. Berî vê yekê edalet gelekî girîng e û ji bo aştiyek domdar mafênd mirovan divê, edalet divê.

Wexta ku qala aştiyê tê kirin dibêjin em bi PKK'ê re rûnanin, hûn vê çawa dinirxîn bi PKK'ê re rûnişin başa an na? Ji ber ku mînakên Filistin, İrlan-da û Çeçenistanê hene.

● Ez pêşî vê bibêjim, PKK di nav kurdan de rêxistîneke gelekî mezin e. Lî hemû kurdan anîha temsîl nake. Hin xeletiyen PKK'ê jî hene, bi tenê li berjewendiyen partiya xwe difikire û li riyên ku xwe meşrû bike digere. Lî divê Tirkîye an bi PKK'ê re rûne, an jî bi hin rêxistinê kurdan ên din re. Divê bi tenê PKK neyî fikirandin, bi tenê fikirandina li ser PKK'ê bi min çewt e.

Bi min heger hikûmeta Tirkiyeyê zagonên ku rê li ber mafênd kurdan ên çandeyî, azadiya derbirinê rake, her wiha ku OHAL, sîistema cerdevaniyê û binpêkirina mafênd mirovan ji holê rabin, wê bingeh ji aştiyeke domdar re çêbibe.

PKK her tim banga aştiyê dike, wê du caran agirbest jî ilan kir, lê tu carî dewlata tirk bersiv neda vê nêzîk tedayînê. Li gorî dîtina we ev gav ne nîşanên xwestina demokrasî û aştiyê ne?

● È belê bêguman PKK'yî jî aştiyê dixwazin, ji wan re jî pêwist e. Hetanî dawiya emrê xwe nikarin vê meseleyê bi şer bidomînin û dewlet jî nikare zora wan bibe. Tu gumana min nîn e ku PKK aştiyê dixwaze, ez vê yekê dipejîrinim. Digel tiştî ku min xwest bibêjim ji bo agirbesta PKK'ê dewlet jixwe tu bersivê nade, li benda bersivê mayîn jî bi min çewt e. Tiştîn ku dikarin bikin hene, lê nakin.

Yanî Tirkîye nake...

● Belê, ji bo pêkanîna aştiyê divê Tirkîye hin tiştîbîne hin tiştan. Her wiha eger PKK çeka deyne di-vê tu kes rê li ber negire û jê re nebe asteng.





Li navendê çandê çalakiyên vê hefteyê.

Li NÇM'ya Stenbolê

● **17.08.1997 Yekşem:** Ji Beşa Sînemayê filmê "Ên ku ji bîhuştê hatine derxistin", derhêner: Franciscos Lambordi, saet:14:30

Konsera Koma Rojhilat, saet:18:00

● **20.08.1997 Çarşem:** Semînera Înstituya Kurdî, Amadekar S. Bulut: "Li Mezopotamîyayê di civakên feodal û koledar de mêtîngîhkarî", saet:18:00

● **22.08.1997 În:** Konsera Koma Agirê Jiyan, saet:18:30

● **23.08.1997 Şemî:** Konsera Agirê Zerdeş, saet:14:30

Konsera Boğaziçi Kardeş Türküler, saet:18:00

Li NÇM'ya Izmirê;

● **17.08.1997 Yekşem:** Semîner û helbest "Ji helbestvanekî re raveyek û xweşxwaniya helbestan", pêşkêşî: Şükrû Erbaş, saet:18:30

● **23.08.1997 Şemî:** Xwarin "Roja Xwarinê kurd yên kevneşopî", saet:19:00

## AWIR

# Ev "Doz" ya kê ye



**M**ississippi û tiştên ku lê têni jiyin ji bo Hollywood malzemeyeke sereke ye. Navenda Çandînî ya Dîtbâri a Amerikayê, wisa dide xuyandin ku li hemberî neheqîyan disekezin, lê li aliyê din neheqî û qirêjiya dewleta xwe bi şeweyekî nerm û germ erêni nişan dide.

Gelek niviskaran xwe di nav vê bazaar Navenda Dîtbâriye ya Amerikayê de dewlemend kirin, iro riya dewlemendîye ji wan re ji duh kurtir e. Ev yek weki kaniya zêr e û vê kaniye ji destê xwe bernadin.

Her wiha John Grisham ji yek ji wan niviskarîn ku bi ser wê kaniye ketine ye. Yen ku temâse kiribin berî vê lêanîna Grisham "A Time to Kill (Dema kuştînî)" de ji parêzerekî ciwan di nav jiyana spîyan de doza reşikan (zenci) girtibû ser xwe. Di filmê Doz (The Chamber) de ji cihê parêzerê ciwan vê carê yekî kal girtiye. Di film de, tê idiakirin ku kalikê vî parêzerê ciwan endamê "Ku Klux Klan" bûye û di salên 1967'an de ji ber bûyera bombekirina malekê ku du zarokên biçük ên cihûyan tê de hatibûn kuştin, dihate darizandin.

Film bi girtina mirovekî pîr dest pê dike. Navê vî mirovî Sam Cayhall, sedema girtina wî kuştina du zarokên cihû ye. Ji aliyê dadgehê ve cezayê idamê li Sam hatiye birîn. Parêzerê ciwan Adam ji dixwaze ku Sam ji idamê xelas bike. Ji bo ku parêzer Adam, Sam biparêze li gorî qanûnan divê ku Sam wekaletnameyê imze bike. Di vê navberê de Sam tê derxistiye ku Adam neviyê wî ye. Adam ji ji bo ku kalikê wî neyê idamkirin di navbera 28 rojan de gelek delîlan berhev dike. Ji ber vê yekê bi Sam li idam xwe payîn geleki zor tê. Lê koma ku

Sam piştgiriya wê dike, mafê axaftinê nade wî. Ev kom ji, komeke nîjadperest e. Endamên komê li dijî çihû û mirovîn reşik çalakiyan pêk tînin û dibêjin: "Di dînyayê de ji me mezintir tu kes nîn e, kesen bêhêz û newêrek divê bêni kuştin."


Di vê navberê de parêzerê ciwan Adam ji ji bo ku kalikê xwe xelas bike û digel bawer dike ku ev zilam bêsûc e, ji bo ku vê çewtiyê rast bike weki dedektifî fekî xebatê dike. Lî têkoşîna Adam bi kérî tiştîkî nayê, ji ber ku di nav vî karî de gelek parlementer, bürokrat û hwd. cih digirin. Berî idamkirina Sam gel li bexçeyê Girtîgeha Mississippi dicive, weki kuştina mirovekî tiştîkî baş be, dilşad û kîfxweşîya xwe nişan didin. Belê disa biryara dawî di destê wali de ye, heger ku wali vê idamê çend rojîn din ta-loq bike, belki Sam ji kuştina bêsûc, bêsebeb xîlas bibe. Jîxwe Adam hetanî dawî ji li benda mucîzeyekê ye, lê ev mucîze pêk nayê û wali dibêje: "Kesen sûdar divê cezayen xwe bikişîmîn."

Belki hûn ji têgîhiştîbin di filmê amerîkî yêni di van demêni dawî de doza dadgehan bi ınfazkirinê encam didin. Wekî berî film li gorî daxwaza mirovan bi dawî nayê. Divê bê dîtin ku ev ji di filman de politîkayeke geleki girîng e. Bi vî awayî dewleta amerîkî bi riya hûner ınfaza dixe rojevê, bi vê mebestê li ber ınfaza asta reaksîyonâ gel dipîve, di-be ku sibe roj vê politîkayê li hin cihan bîmeşîne.

Ev film ji romaneke bi navê "The Chamber" bi tirkî "Gaz Odası" ji aliyê John Grisham ve hatiye wergirtin. Lîstikvan: Gene Hackman (Sam Cayhall), Chris O'Donnell (Adam Hill)

## TÎŞK

LERZAN JANDIL



"Vate"

**V**ate" nameyê yew (jû) kovarêde kulturî yo. Hûmara (maraya) 1'ê na kovare hamnanî 1997 de veciye. Ez her çî ra ver, veten û veciyena kovara "Vate" yî û hevalanê (albazanê) ke vetena "Vate" yî de wayîre kar û kedî yê pîroz kena. Karo ke nê hevala kerd, bêguman zaf bi qedr o..

Ganî bêro zanayene, ke hevalê ke seba vetena "Vate" yî amê tê lewe yew. (jû) bawariye de niyê. Der heqê alfabe de, raşt-nivisnayene de, gramerî de, hatanî der heqê bawariya politîke de jî ne wayîre bawarîyanê ciyaya nê û her kes ji hetê xo ra wayîre zanayenêde bi qed bivecere, ne ke bawariya xo ra derbaz bibê. Ganî wunciya bêro zanayene ke demê nê hevalan malê nê hevalan zerê karê vetena "Vate" yî de cayêde bingeyîn gênê (cênê).

Ma de edet o. Vanê ma çinayî re kovarêde newiye?

Verê cewabê na perse ganî rind û bê şik bêro zanayene, ke "Vate" kovarêde kulturî û kurdistanî yo. Zonê "Vate" yî kurdî, ebi zarava kirmancî (kirdkî) yo. Kesê ke ebi ked û emegê xo Vate' yî vecenê, wazene ke metodan û krîteranê newe û hemdeman bixebetnê tenganê (tengasîyene) kanan ra bivisîyê û çiyêde newe û bi rûmet biyarê meydan.

Sebebê vetana "Vate" yî ya bîne awa, ke fekê her hetî, fekê her dewe ebi zarava kirmancî bero nivisnayene. Eke kovare de nê fekî amê nivisnayene, mordem şikîno fekanê yewbînan (jûbiyena) fam bikero, bimusû û bado ji qese bikero. No ji beno sebeb û bingeyê yewbîna (jûbiyena) zarava kirmancî.

Yewbiyena yew zarave xo miyan de bina bingeyê yewbiyena zaravanê bîna ji. Yanê eke yew zarave xo miyan de yew niya, nêşîkîna ebi zaravanê bîna yew bo, yan ji bero yew (jû) kerdene. Na ganî her kesê ma-re zelal bo.

Tayê kesî şikînê vacêre: "E rind, şima weş vanê. La belê hundê kovarê ma kurdan estê, qeyî nê kovaran de nêno nivisnayene, qeyî kovarêde newiye vecîna?

Yan ji tayê kesî şikînê vacêre: "De, qe çiyê te de çîno. Bîla sebe bîla heqe hunde mesref kerdî, kovare veta, la belê a bi xo tip û tal a."

Yan ji tayê kesî şikînê vacêre: "Her çîqa ke nê hevalî fîkî xo eşkera nêvanê ji, nêtê nînan rind niyo."

Cewabê nê persan pêrîne na wo.

Huna ke şima hukme xo nido ci, keremê xo rîy biwanê, hevelan de kontakt girêde, ebi nameyan cewabê persanêxo biwazê û her çî ra ver ji fîkî xo "Vate" yî re binivisne. Eke mordemî nê karî kerdî, bado şikîno, ke vacêro; "Hêya ne kovare rind a, yan ji xirab a, yan ji ....a."

Seke nêno zanayene, seba standardîzekerdena zarava ma, alfabe ma, viraştena termanê newiyan eke mumkun bo vetena pirtûkan û vetena "Vate" yî xêlê hevalî ênê tê lewe, kombiyenê virazenê. Rojanê 1-2-3. 08.1997 de yew kombiyenêde bîne amê viraştene. La belê na kombiyene zê kombiyenê bînan ebi berhemanê zafan nêqêdiyê, zê yê verênan efektîv nêbiyê. Ez bawer kena ke hevalî seba kombiyenê bînan nika ra fikirînê û sebeta ke bişîkiyê biresê berhemanê xurtan, nika ra dest berzê karê xo.

Ez hêvî kena, ke kovara "Vatê" yî dolabê pirtûkanê her kurdî de, dolabê pirtûkarê her Înstitûtsiyonê kurdî de ca bivîno. Cavê xo bicêro.

# Biratiya Şêr û Mar

Şêrê azad serbixwe  
 Digere, navçe bi navçe  
     Mirovperwer, alîkar  
     Neditirsî ji neyar  
 Wî kêt dikir bi dema  
 Nediket derd û xema  
     Rojek zivistanê sar  
     Şêr rabû daket zinar  
 Berf weke kulî tê xwar  
 Rojek seqem û pir sar  
     Geriya hinkî li der û dor  
     Ji serma pir neçû jor  
 Şêr ket rê, ku were mal,  
 Dengek ji-jor hate xwar  
     Wî baş fêr kir li banî  
     Tiştek nebû xwiyâni  
 Zîvîri ser riya mal  
 Li jor bû qîr û hawar  
     Şêr xwe li nalînê girt  
     Çû ser termê marê hişk  
 Gote: Ker mar çi ye  
 Ev çi qîr û gazkiye  
     Mar ji serma bû gilok  
     Berf, kire mîna cihok  
 Ji serma tev hizhîzi  
 Canê wî tev lerizi.  
     Koremar got: Apê şêr  
     Gelekî ji te dikim fêr  
 Ez bejî dirêjim  
 Bi dil ji te re bêjim.  
     Li herêma pir sar  
     EZ lê bûrma stûxwar.  
 Ka ez lingê te ramûsim  
 Edî xizan û pûç im.  
     Rewşa min pir xerab e,  
     EZ ci dikim çare nabe  
 Hêvî dikim ji boyî te  
 Tê min bibî li gel, xwe  
     Şêr li rewşa wî nêri  
     Got: Binede ezbenni.  
 Bi vi hawî gelek car,  
 Min ling di xefka de xwar  
     Tu qefiliye bûye pind  
     Bûye mîna pûtê kund  
 Mar got: Em bibin birak  
 Ava kin jiyanek pak  
     Şêr dom kir û wiha got:  
     Te nava dilê min sot.  
 Ez dikim biratiyê,  
 Li ser xeta rastiyê.  
     Pêşniyârê min hene,  
     Lê ew qanûn namîne.  
 Mar got: Kanî ji min re bêj  
 Wan qanûnê xwe yî dirêj.  
     Şêr qanûnê jiyanî,  
     Yek yek ji mar re danî  
 Got: Biner ez ne xwîn xwarin  
 Belê ez pir xedar im  
     EZ mirovek azad im  
     Derekê bê ger bernadim  
 Bi kesî naşewirim  
 Tevli karê xwe nakim  
     İro va ez li vir im,  
     Sibê li derek din im.  
 Ezê Şerek seya rix,  
 Her der dikim tar û mar  
     Ji Entap heta Kerkük  
     Nas dikim nenûk bi nenûk

Salek diherim Qamîşlo  
 Sala din diherim Mako.  
     Li her çar aliye welat,  
     EZ nas dikim lat bi lat  
 Wexta çêkirin sînor  
 Dîsa digeriymam bi dor  
     EZ wan sînora nas natim  
     Ji min bê, ezê xera kim  
 Dema welat par kirin,  
 Mala min xerab kirin  
     Berê ev der xalî bûn  
     Meskenê şêrê şîn bûn  
 Vê de tev de ême bûn  
 Jî me pê ve kes tune bûn  
     Em pir mirovperwer in,  
     Rû li kesî naguherin.  
 Ki hat, me kir mîvan,  
 Paşê li me bûn sermiyan.  
     Em bi Gur re bûn heval,  
     Wî em xistin bin qeyd û dar.  
 Em bi rovî re bûn heval,  
 Wî warê me kir çar par.  
     Pişt ra gotin şêr nîn in,  
     Ji eslê xwe ve çiyayî nin.  
 Hate cem wan, Kerê şâşik şîn,  
 Got: Ji van peyva re amîn.  
     Ker jî bi wan re bû heval,  
     Welat li hev kirin par.  
 Tu jî li me wiha neke,  
 Li mal bêhna xwe veke  
     Bi te re dibim heval  
     Lê heta bibe buhar  
 Wexta ku zivistan çû  
 Buhar wê xwe berde dû  
     Lê dema şîn bû bihar  
     Emê her kes herin mal  
 Her kes lawê bavê xwe  
 Xwediyê cih û warê xwe  
     Em serbixwe ne her cara  
     Bi zor em nakevin bin tu bara  
 Em ciwan merdin heta talf  
 Ji rastiyê em xwe nadin alî  
     Mar got: Birakê şêr  
     Peyada nabin wek te mîr  
 Tu ci bêjî ser sera  
 Min derxe ji nav bera  
     EZ ne dîn im ne ker im,  
     Çawa rû li te biguherim.  
 Tu bi xatirê kalê Medî  
 Tê li min bibî xwedî.  
     Soz û qira ji te ra,  
     Tu ci bêjî ser sera  
 Hûn ci bêjin ji bo min  
 Li ser herdu çavê min  
     Şêr, mar li nav mila kir  
     Qesta nava mala kir  
 Mar got: Kekê şêr ku tu neba  
 Ez dibûm xwarina teba  
     Gelkî ji bo te sipas  
     Ji serma kirim xelas  
 Şêr rahişte koremar  
 Bi lez berê xwe da mal  
     Her du li mal rûniştin  
     Zahmetî li paş xwe hiştin  
 Şêr agirekî dara  
 Marê reş li ber rada  
     Tîna agir xwe da dor  
     Mar xwe li ber kir kilor

Şêr hêdî serî rakir  
 Du denga gazî mar kir  
     Divê ku hinekî razim  
     İro ez bêlengaz im.  
 Heta min tu anî mal  
 Hêsanî nebû heval  
     Tu zanî pir westiyam  
     Hingî ku ez beziyam  
 Niha cihê xwe xwes dikim  
 Da ku çava nerm bikim  
     İcar tu min bibexşî  
     Ji xewa ez dibim dîn  
 Mar got: Emin xewa min nayê,  
 İşev dikevin tayê  
     Şêr hêdî serî danî  
     Ket kewê bi giranî  
 Mar rabû geriya li dor  
 Xwe gerand li stûna sor  
     Kere hingî ku pir xwar  
     ik kir wek meşka li dar  
 Xwe şemitand ber derî  
 Bîskê li derive nêrî  
     Dît ku derive pir sar e  
     Berf bi lepa tê xwar e  
 Ji ber derî hat hundir  
 Cihê xewa xwe çêkir  
     Hêdî serê xwe danî  
     Ket xewa zivistanî  
 Sibehê zû şêr rabû  
 Deng lê kir got: Rabe Mar  
     Te bigerînim li cih û war  
     Doh ez pir bê hal ketim  
 Ji ber wê, ez zû raketim  
 Şêr, mar hilgirt û meşya  
     Ket nav dar û deviya  
     Gerand gelî bi gelî  
 Pir bi tab û sêfilî  
 Cend roj, çend meh buhirî  
     Buhar şîn bû kemilî  
     Rojek li Qerecadaxê  
 Hatin ber piyê avê.  
 Ava Dîcle dinale,  
     Pêl li ser pêl dikale.  
     Şêr, hinekî mar bir û anî  
 Wî deng ji xwe dernanî  
 Şêr bi hêdî gote mar  
     Va ye li me bû bihar  
     Edî dinya pir germ e  
 Ne sir heye ne serme  
 Min ji te re, dabû biryar  
     Heta ku bibe bihar  
     Edî tu bi serxwe hatiye  
 Hem xurt û jêhatî ye.  
 Zû de qetiyame ji mal  
     Ji zarok û ji eyal  
     Divê ez herim warê xwe  
 Cem jin û zarokê xwe  
 Ezê herim wî alî  
     Riya xwe bikim xalî  
     Ava Dîcle bi himet e  
 Bi hiner û heybet e  
 De ka bi xatirê te  
     Ka ez ramûsim çavê te  
     Mar got: Şêr heval  
 Tu yî mirovkî pir delal  
 Qenciya te li ba min  
     Qet naçe ji bîra min  
     Mar xwe li girî danî

Hêşir kirin wek baranê  
 Got: Ava Dîcle gerav e,  
     Ez nikarim bidim nav e  
     Min bibî wî alî avê  
 Bes min tişkî te navê  
 Di van çar mehê havinî  
     Herim Asya Navinî  
     Dilê Şêr şewitî pê  
 Birînê wî kir bi xwê  
 Şêr got: Were pişta min  
     Xwe bigerîn li qırka min  
     Rabû zû xwe kir siyar  
 Zû daket nav ava sar  
 Hêdî berwár û berwár  
     Bi zor xwe avêt cobar  
     Bi zû ban kir kekê mar  
 Xwe veke zû were xwar  
 Bêhna min tev çikiya  
     Xwe nagirim li piya  
     Mar got: Hey şêrê gewr  
 Min pir borandin dem û dêwr  
 Qey dikeve serê te  
     EZ xwe vekim ji stûyê te  
     Edî biratî nema  
 Bes bike derd û xema  
 Niha ezê bi te vedim,  
     Jahra xwe bera te dim  
     Hîn ku tu nebûye gêj  
 Ka zû wesiyeta xwe bêj  
 Şêr gotin çend peyvê kufarî  
     Mar, bê his lê kir guhdarî  
     Ewqas ked û tâba pir  
 Tevda min li ser te kir  
 Wê serma zivistanê  
     Tu mabû li bin berf û baranê  
     Ma biratî wiha yê,  
 Wesa li ser linga yê?  
 Te digot emê bibin birak  
     Ava kin jiyanek pak  
     Şêrê kore û zanyar  
 Mar, bi tana kire jar  
 Nema zanîm ci bêjim  
     Ji boy te ez xemrêj im  
     Dixwazim te maçî kim  
 Dilê xwe baş saffî kim.  
 Mar, serê xwe der anî  
     Ber bi devê Şêr de anî  
     Hişk girt bi serê mar  
 Ji stûyê xwe anî xwar  
 Li erdê xist weke tîr  
     Jê re got: Xayinê pîr.  
     Cend cara rawejikand  
 Serê wî perçiqand  
 Mar xwe xwaro maro kir  
     Şêr pê girt û ew rast kir.  
     Got: Biratî rast û rê ye,  
 Ji bona demê xwes û mirovê çê ye  
 Biratî bi rastî ye  
     Ne xayıntî û canbazî ye  
     Tobe dikim bi dilê ges  
 Nema didim dû kerê res  
 Min sozek daye ji dil  
     Bi gur re bûme dijmin.  
     Sond dixwim bi hezar car  
 Nema bi mar û roviya re dibim heval

# Kovara Vate

Nê panj şes seranê peyinan de ziwanê (zonê) ma de taybefî zarawayê kurmancî de xeylê rojnamey, kovar û pirtûkî vejjay. La belê zarawayê dimili (kirmancî) de çend pirtûkî vejjay û nînana piya, xeylê rojnaman û kovaranê kurdî de niwîsê dimili vejjay. La belê nê ji çewtin û kemiyyin ra pir bî. Qandê çewtin û kemiyyin nê niwisan ra, kesî vêşî fahm nêkerdê. Çira fahm nêkardê? Loma (çimke fakat) êkê nê pirtûkî û niwîsi nûstê zafînî gramer nêzanayê. Zewbî ji, êkê dimili qisey karde pêjewinan ra dûrî bî û hecetê weşînayin (iletişim araçları) çinê bî. Bazarê neteweyî bandor (işgal) bind bi û iradeyo siyasi çinê bi. Nînana piya ziwan û alfaba de jûwin (birlîk) çinê bi. Her nûştoxi goreyê dewda xo nûstê, ancî (onca fi-na) her nûştoxi jû alfebawa nûstê. Coka nê pirtûkan û niwisan de kemiyyin û çewtîni zaf zaf vêşî bî. La belê ma ke, ewnayme ewro, ma ji zey şaran dê binan bîm wayirê iradeyê siyasi. Sha-ro ke, bibo wayirê iradeyê siyasi, kemiyyin û çewtîni jew jew werte ra hewadiyenê. Ewro ma kurdan de oyo wina beno. Bewnê verdê 5-6 se-ran hema hema tevayê ma çinê bi. La belê ewro parlemento ra tepşim, hetanî telewizyon estê. Nê wini xo ra nêvejjay werte. Nê pêro mexelê (ürün) iradeyê siyasi yê. Mexelê iradeyê siyasi yo roj ra roj beno vêşî û kemiyyinê werte, ra hewadiyenê. Nê mexelan ra jû ji, nê rojan de vejjê werte "Kovara Vate"

Kovara Vate roşnikarê dimiliyê ke, teverdê

welati de manenê, ïnan na meng (aşm) de teverdê welati de vete. Zek yeno zanayin 4-5 mengî yo (aşmiyo) hevey roşnikarê ke dimili ser xefti-yenê, teverdê welati de amey pêser û mesela di-mili sero vindardî û pê peyra, 2 pêseramayin Stockholm de virastî û 2 broşûrî vetî. Nê broşûran pey ra ji kovara "Vate" vete.

Kovara "Vate" 112 rîperiya, 3 aşmina tû pêro ji dimiliya, la belê niwisan de standartin çinyo. Her nûşto-

xî ciya ciya nûsto. Xora (zaten) kovar de nûş-yawo ke: "Ma wina kerd ke, wa hemû wendoxî ni-wisan ra fahm bik-rê." Ancî kovar de nûşyawo ke, "ziwanî satandardize kerdin karê jû aşm, yan ji karê jû ser niyo. Coka ma wi-na nûst, la belê madê nû-wa tepeva vera vera giranî bidê standartina zarawayâ dimili. Kovara "Vate" pê-westinê (önemli) zewbî ji es-tê. È ji êkê kovar de nûştoxin kenê, vejjayina kovarê hetkarin kenê. Fikrê ïnano siyasi ji ciya ciya wo. Nûwo ji zewbî kêfweşin dano ma.

Kovara "Vate" de Munzur Çe-mî, "Roze ve roze pê ma xapit hata ke ma Qir kerdime.", Kazim Temurlenkî "Game be game", Haydar Diljenî "Nûştox, ziwan û şesxi-yeto netewî", Cemil Gundogani, "Tayê problemê satandizekerdena ziwanê kurdî" û Mansimani ji "kirmancî (kirdî) de sufiksi" ser niwîs nûstê û kovar de giranî nê nameyê yenê çiman ver.

Adresê wastin: Odd Fellowvagen 29 S-127 32 Stockholm / SWEDEN

MEMED DREWS

# Jiyana Rewsen

Højma-  
r 11'an  
a kovara Jiyana  
Rewsen derket.  
Di vê hej-  
marê de  
giraniya  
helbest  
û ni-  
vîsîn  
l i  
ser  
helbes-  
tê xwe didin  
pêş. Helbestvanen ci-  
wan İbrahim Aydoğan, Kawa  
Nemir, Hesoyê Çelo û Osmanê  
Mehmed her çiqas di warê ho-  
nandina helbestê de kemasiyên  
wan hebin ji, lê ji bo helbesta  
nûjen a kurdî hêviyê didin mi-  
rov.

Di pêşgotina kovarê de bi şe-  
weyekî helbestî li ser 15'ye ge-  
lawêjê hatiye rawestin. Bêgu-  
man di vê hejmara Jiyana Rew-  
sen de nîvisîna heri hêja û bal-  
kêş, hevpeyvîna ku bi Şerko Bê-  
kes re hatiye kirin e. Hevpeyvîn  
ji aliye Murat Batgî ve hatiye  
çekirin. Helbestvanê kurd, di  
hevpeyvîhê de li ser taybetmen-  
dî û pîvanen helbest û helbest-  
vanyê, helbesta Kurdistanê, tê-  
kiliyên huner û siyasetê û li ser  
mercîn pêşketina zimên dîtin û  
ramanen xwe anînê zimên.

Di gel ve nîvisî, Hesen Zinar  
ji li ser jiyana helbestvanê kurd  
Qedîcan rawestiyayê. Zinar di



nî-  
vîsî-  
n a  
xwe de  
balê di-  
kişîn e  
ser nûje-  
niya hel-  
besten Qed-  
rîcan û sos-  
yalistiya wî û  
serdana wî ya ji  
bo Moskovayê.  
Her wiha M.  
Zahir Kayan li ser  
xebatê NCM û sê-  
weya meşandina kar  
nîvîsek amade kiriye.

Dîsa di vê hejmarê  
de ji ji Rojhîlatê Kurdistanê Şî-  
yar Oremar bi nîvisâ xwe ya bi  
navê "Rewşa Ferheng û Barê  
Ramyarî di Rojhîlatê Kurdistân-  
ne de" cih digire. Nîvisâ bi navê  
"Newala Zapa Mezin" ku ji ali-  
ye dîrokzanê Ingiliz Freya Stark  
ve hatiye nîvisin. Stark di salen  
1930'î de li Rojhîlata Navîn ge-  
riyaye û çavdîriyên xwe nîvisî-  
ne.

Di kovarê de kêmasi bi pira-  
nî di warê rastnîvisinê de xwe  
didin der. Divê xebatkarên ko-  
varê li ser vê mijarê bi şewe-  
kî baldarî û hûrbîn rawestin.  
Her wiha ji ber kîjan egeran e,  
mirov nizane, di kovarê de nî-  
visînen dimîkî (zazakî) cih nagirin.  
Ev kêmasiyek e. Yek ji divê  
rûpelek ji bo ferhengokekê bê  
terxankirin.

SERWİSA ÇANDÊ

## Havîn germ e, lê têkoşîn germtir e

AHMET BARACKILÎC



I sal ji mîna her salê li Ewrûpa havîn nîn e. Dema ku mirov havîn dibêje tava bi tîn, kela germa havînê tê bîra mirovan. Lî mixabin ew tîna havînê û germahî tune. Bi rastî hebe tunebe, ji bo me zêde girîng ji nîn e. Mijara vê nîvisâ min li ser havînê bû, ji bo wê min bi havînê dest pê kir.

Di ser me re gelek sal û demsal derbas bûn, me ne Bihar, ne ji havîn mîna biyaniyan jiyaye. Ji bo me germahiya havînê girîng nîn e, ji ber ku em bi wê germ nabin, germbûn û bi hêzbûna me, girêdayî geşbûna doza neteweya me ye. Xem û xeyalîn me, jiyana me ya rojane girêdayî azadbûna neteweya me ye.

Gelên ewrûpî û li ber behran xwe

didin ber tavê, hewaya xweş digirin. Westandina salekê ji ser xwe davêjin, hêjmara van bi milyonan e. Ewrûpa her sal 200 milyon turîst rî dike û dike mîvan, ji van ji sedî 5-7 diçine Tirkîyeyê. Tirkîye bi milyonan dolar û mark ji wan hildigire û ji bo berdewamkirina şerî qirêji li dijî gelê me bi kar tîne. Dewleta tirk û saziyên wê balyozxaneyen wê li Ewrûpa bi gelek awayan progandeya, bangeşînê dikin û pesnîn welatên xwe didin û dixwazin turîstan bikşînin Tirkîyeyê. Mebesta wan ew e ku şerî qirêji bala kesî nekişîne û ew bê astengî şer bidomînin.

Li Ewrûpayê bi sed hezaran gelê me dijî, bi ewrûpiyan re kar dikin, diçin dibistanan, an ji têkiliyên wan ên cîranî, dostî û hevaltî hene. Dîsa li metropolên tirk, bi milyonan kurd dijîn. Divê em der û cînarân li ser şerî qirêji agahdar bikin da ku ew neçin û neyin Tirkîyeyê. Divê em ji neçin, erd mal û hwd. li Tirkîyeyê bazırganiyê nekin, pereyên biyan em nedin

Tirkîyeyê. Her kesekî ku diçe Tirkîyeyê û dolar an ji markekî li wir dihêle, dibe sedemê kuştina çend kesen dilsoz, welatparêz û ronakbir. Baca ku em didin, dibe sedema bombekirin û valakirina çend gundênen me. Divê û pêwist e em kurd di vi alî de û di vê eniyê de têkoşîna xwe bi pêş bixin.

Tîrkan seranserê qêrâxên behra Ege û Behra Spî kirine hêşînahî û plaj. Col û bejahîyên xwe kirine cihê seyran û vehesandinê. Bi sed hezeran, hotel, motel û qesr û qonax çekirine. Zinar, lat û şikeftên wan bûne cihê serdana (ziyaret) turîstên biyan. Lî li welatê me daristan, gunî, kelem û tu hêşînahî nehiştin, tevahî hatine şewitandin. Gund û malen dirokî hilweşandin, li zozan û warêne me ji dêla bêhna gul û kulîlkan, bêhna barûdê tê, li hawîrdorê şikeft û gelyîyen me bi tonan bombe dîbarînin. Kanî û delavêne me jahrê dixînê. Xwarin û lixwekirin qedexe bûye. Divê em kurd bersiva wan bidin. Dema bêhnvedan û seyrana xwe bi têkoşînê derbas bikin.

# Sê şertên mêvan

**Z**ilam li destbirakê xwe rast hat:  
— Yaho destbirak tu xuya na-  
kî, ev çend sal in tu ber bi me ve  
nayê. Kerem bike, were em rû-  
nin ii xwe re xeber bidin.

— Baş e ezê werim, belê sê heb şer-  
tên min hene.

- Ícar ev ci ye?

— Tu sebir bike ezê ji te re yek bi yek  
bibêijim.

Cihê ku ez hatim lê rûniştîm ger tu li  
min nekî zîndan. Ev yek. A dudiyan  
xwarina ku bixwim ger tu li min nekî  
jehr û ziqûm. Ya sisîyan tiştên ku tu jê  
hez dikî ger tu bi min nedî hezkirin.

Zilam sas ma ū got:

— Min tiştek ji van gotinê te fêm na-kir, tu ci ji min re dibêjî?

- - Yanî ez dixwazim vê yekê bibê-jim. Gava ku ez hatim mala we û cihê ku min eciband û ez lê rûnim, tê bêjî: "Destbirak ew der ne cihê te ye, rabe kerem bike were li vê derê rûne" Çiqas bêjim na ez wiha rihet im jî, tu min ri-het nehêlî, tu bibêjî: "Rabe rabe li vê de rûne." Hîn ez cihê xwe xweş dikim, pî-reka te dikeve hundir û dibêje "Mal nexirab ma cihê kekê min wê derê ye. De kerem bike li serê odê rûne." Ez li serê odê rûdinim, diya te di derî re xu-ya dibe, "Lawê min duh ez li ber wê



pacê rûniştîm, ez nexwêş ketim, iro du  
roatjê min in ku ez nikarim pişa xwe  
rast bikim. Li wê derê rûnene, li jêr rû-  
ne.” Dû re bavê te berî xêrhatinê wê  
bêje “Mala we Xwedê ava bike, ma ci-  
hê mîvan ev odaya teng e? Kerem-  
bike rabe emê li eywanê rihet rûnin.”  
Bi vî awayî cih li min dibe zîndan.

Ya duduya pişfi ku em li ser sıfrê rû-niştin, xwarineke bi dilê min were bermin. Tiştê ku ji min re lazim be ezê bi-xwim. Tê dîsa bêjî de bixwe lo xwarina me iro pir xweş e. Ez kevcî deynim, tê israr bikî, "Ma bi navê Xwedê tê çend kevçiyêñ din jî bixwî." Dû re pîreka te

wê tasika tijî xwarin tijî ber min bike. J  
bo ku ez ber xwe safil bikim bi lez e  
dixwim, di nava xwêdanê de mame  
Diya te heskek din vala ber min dike  
“Lawê min ma qey xatirê min li ba te  
tune ye? Çend kevçîyan jî ji bo min  
bixwe.” Bavê te, “Xanim rast dibêjê  
mirov kare ji bo xatir mirışkek sax bix  
we. Tiştek nabe ava me zahf rind e tu  
tasek av bi ser xwerinê de vedixwî v  
gavê dimehîne, bixwe lawê min bix  
we.” Beri ku xwarina duyemîn were e  
bûme weki kundirekî cila, cihê xwarin  
bi min re namîne.

Xwarin bi vî awayî li mirov dibet

jehr ü zigüm.

Ya sisîyan jî emê ji ser sifrê vekişin û pala xwe bidin balîfê ku kêlikê em xwe rihet bikin. Wê bavê te biçûkê mälê, neviyê xwe yê porjîjû û ling çaqîtik bi ser min de bişînî: "Mêze-bike apê wî kesekî wisa xweşik hatiye dînyayê?.. Here kurê min here destê apê xwe maçîke." Ji bo ku ez bêjîm 'Maşalla ji hizna Xwedê re çi kurekî xweşik e, Xwedê wî ji nezera çavan bi-parêze" her kes li hundirê çavên min dinêre. Ez dikim ku xwe ji kefa lêwik xilas bikim, albûmek wêneya mîna derîkî li ber min vedibe. Pel bi pel di qu-libînin.. Ji alîkî ve bavê te wêneyê xamî û pirê mezin nîşanî min dide: "Ev bî-naya bilind ku tu dibînî tev hunerê zavayê min î mezin e." Tu keça malê râyê min didî, "ev jî keça min î herî biçûk e. Diçe ba Leon dersa kemanê dibîne. De rabe keça min kemana xwe bîne bi-la apê te hebekî kêfxwes bibe." Wê ga-vê wekî ku çend heb ga bi hev û du re di hundirê mejiyê min de digerin. Belê ez mecbûr im guhdar bikim.

Tiştê ku ez naxwazim tu bi min bîdî  
hezkirin jî ev e.

Ku tu van tiştan bi serê min de ney  
nî ezê werim mala te, çima ez nayêm?

**BIXELAT...**

**XACĘPIRSA BIXELAT (81)**

# XACEPIRSA

**Bersiva Xaçepirsa 79'an**

Xaçepirsa me bixelat e.  
Di 15 rojan de çi bersiv  
bigihijin me, emê wan  
binirxînin û bi riya pişkê li 5  
kesan belav bikin. Xelata  
hejmara me ya 81'ê Kaseta  
**KIZILIRMAK** (Günden Dün) e

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê  
nirxandin, divê hûn  
“Peyva Vêşarı” di nava  
qutiyen li bin xaçepirsê d  
binivisîn û teví navníşana  
xwe ji me re hisinîn



Pênc kesên ku xelata xâcepîrsa hejmara 79'an pirtûka  
Beyani Şahin (Lêkolîneke Qicik Li Ser Zimên) qezenc  
kirine. Zana Yılmaz/ Bazîd, Berîvan Altımişik/ Batman, Ali  
İmer/ Ankara, Mubarek Oğuz/ Stenbol

Bî zazakî karîk (wêne)		Bî zazakî hevalî Qeyd kîrin		Serbestî Agîr		Fêkiyek		Bî giştî Xwarina bingehin		Navek
		6				4				
Heywanek						Enîste				
Qeta						Çeng				
Lê belê			Xwerdepa sek Sixur				Ne biyan			
Gihanekêk		2			Bî zazakî yek Paytexta kurdan				Pasgirek	
	Kîjk							Rengek		
Cêriyan								Qayîl		
Cinavkeke pirsiyartîye Bî awayê mêran			Halet Endam	5						
Bîrinc							(berepaşklı) Qertafek			
Sitare			Kesê dizek Hidrojen							
		3				Darek				

PEYVA VESARI



1 2 3 4 5 6



## Destpêk rûpel 3

**D**îsa rojekê, di dema Doğan Güres de em birin çiyayê Agirî û gotin 300 terorist hatine kuştin. Me got em wêneyan bikişinin, lê gotin hemû bi xwe re birene. Li ser vê yekê min got: "Ev çawa ev qas kesi bi xwe re dibin. Jixwe çiya her diçe bilintir dibe. Ev çawa dikarin....!" Heta hejmarâ "terorist" ên ku hatine kuştin, ji sê qatî yên heyî derbas bû.

Binérin! Bêyî rastbînyê ev kêse çareser nabe. Ku te mirov wekî tawanbarê potansiyel ditin ev kêse çareser nabe. Ez dixwazin mînakekê bidim. Min xwast ez herim Licê (li Tirkiyeyê ji bili Licê ez ketim her derê). Min taksî ajotina şofêrê taksiyê neeciband. Min taksî bi xwe bi kar anî. Wê demê rih û simbîlen min hinekî dirêj bûbûn. Gava em ketin Licê leşkerekî got. "Ez dê diya ..... ê dakeve jêr.....!" Li ser vê yekê ez jî hêrs bûm. Leşker dît ku tırkiya min baş e, got: "Bîfermîne fermandarê min." Lê, ku tırkiya me nebaş bûya, meyê dipçik bixwara.

Divê bêyî pakêtên qaço, ji dil nêzî kêseya Başûrê Rojhilat bibin. Divê em ji mirovan netirsin. Em dilen tîrsen xwe ne. Hin kes ji min re dibêjin: "Ma tu natırsî?" Ez geleki dilşîf im. Heke ji vî gelî zerar bigihêje min, dilopek xwînjî ji min naçe.

Tîştekî ku herfi pir ez pê xemgîn dibim ev e ku gelê kurd kirin parsek...

Her wiha li ser rîzenivisa Özcan Ercan a ku di rojnameya Milliyetê de hate weşandin ji me dîtinê Cigirê Serokê Giştî yê CHP'ê û Mebusû berê yê Dêrsimê Sinan Yerlikaya

pirsin. Yerlikaya da zanîn ku wî bi xwe jî li dijî wan rîzenivisan nerazibûna ji amadekarîn rîzenivisê re anye zimên. Piştre jî got ku van kesan bi tenê wali û midûrê emniyetê dîfîne û ji navenda Dêrsimê derneketine. Yerlikaya wiha berdewam kir: "Dema zîlm û zor li herêmê zêde dibe tiştan, tînin rojevê. Armanca nîvîsîn bi vî rengî, domandina zîlm û zordariyê ye. Ev kes rûyê rast ê Tunceliyê nîşan nadîn. Pirşirêkîn rastin li gund û pesara Tunceliyê diqewimin. Li van deran mercen jiyanê nemane. Lîgerina leşkeran, ambargoja xurekan...hwd. Ez iro ji Tunceliyê hatim. Ez ji ci behs bikim! Lî her tişt baş dan xuyakirin. Min jî ji wan re got ev kirina we serm e."

Her wiha Nîvîskarê rojnameya Radikal Koray Düzgören ji roja 8'ê gelawejê rexne li nîvîsîn navborî girt û diyar kir ku Tırkiye bûye "bihuştâ nûcîyê xweş" û rewş bi awa'yê ku tê xwestin tê nîşandayin. Düzgören bûyera gundê Halvorîyê (Karşilar) bi bîr xist û wiha nîvîsî: "Li Tirkiyeyê tê xwestin ku kes qala ambargoja nemirovane ya Tunceliyê neke, lê bi tenê qala bedewiya çiyayê Munzur bike û bibêje gel gelekî bextewar e."

### Dewlet dev ji cerdevanîyê bernade

Weki tê zanîn pişti bûyera Cizîrê cerdevantî disa di rojevê de cih girt. Digel ew qas xeletî tû şasyan, dewlet dev ji cerdevanîyê bernade. Li ser vê yekê Sinan Yerlikaya bal kişand ser politikayê dewletê û got ku dewlet bi zanebûn sisteme cerdevanîyê ji holê ranake. Li gorî Yerlikaya ev tîştekî gelekî diyar e. Rêveberê CHP'ê wiha berdewam kir:

"Li herêma me feodalizm ber bi tunebûne ve diçû. Gel bi xwe hesiya, li nasnameya xwe xwedî derket. Dewletê ev yek dît û ji bo xurtkirina feodalizmê sisteme cerdavantiyê damezirand. Niha cerdevan li gorî dilê xwe tevdigerin, her tişt di destê wan de ye. Jixwe giş nezan in, xwendin û nîvîsandina wan nîn e. Di perçiqandina gel de rola cerdavanan gelekî girîng e."

### Serokê belediyyeyê yê CHP'yi fetullahiyan tîne Dêrsimê

Weki tê zanîn berî vê demekê, rojnameyên tîrk ragihandibûn ku, li Dêrsimê faşist amadehiya vekirina ocakekê dîkin û nîvîsandibûn ku li wir bandora fethullahiyan zêde dibe. Li ser vê yekê Yerlikaya agahiyên balkê dan. Li gorî ragihandina wî, serokê Belediyye Dêrsimê yê CHP'yi Mazlum Aslan pêşîya fethullahiyan vedike û ji gel re dibêje ku li televizyona fettullahiyan temaşe bikin. Li ser pirsa me Yerlikaya got ku wan, serokê Belediyye hisyâr kiriye. Lî, a girîng gel pir bi hêrs e û li dijî vê yekê derdikeye. Yerlikaya ji bo ocaxa faşîstan jî diyar kir ku, ve bûye lê dest bi xebatê nekiriye.

Li ser pirsa me ya der barê gotinê wî ku di rojnameya Yeni Yüzyılê de hatibû weşandin, Yerlikaya da xuyakirin ku gotinê rastearast nehatine weşandin. Wî tu carî negotiye ku ji bo gelê Dêrsimê kurditî ne girîng e, tiştî girîng alewîtî ye. Yerlikaya diyar kir ku bi taybetî tîrsa dewletê ya ji gelê Dêrsimê ji ber ew hem kurd, hem alewî û hem ji çepgir in.

MAZLUM DOĞAN

## Ferhengok

bîz: bilind  
bi gelempesi: bi giştî (genelde)  
boçm: dîtin, raman  
cebilxane: cephexane  
cewdîk: şuna cek û şûran (kin)  
civatzanîn: civaknasî (sosyoloji)  
çep: senger, binecîh, mewzî  
damezîner: avakar, sazûmankar  
dan: katki  
derbîn: ifade kirin  
dilsoz: bi gotin û doza xwe girê dayî  
dîn: din, di (diğeri)  
domdar: timî, berdewamî (sürekli)  
engîz: sedem, eger, sebeb  
rena: wekî, mîna, nola (gibi)  
fûfin: uçuşma  
gels: kêse, pirşirêk, problem

pesar: çolter (kir)  
pêrginî: pêşwazî (karşılıkama)  
pêşenda: rînîşandar (yol gösterici)  
ramanwer: zanyar, filozof  
ramîn: fikirîn, hizirkirin  
reşbinî: bedbînî, pesimîst (karamsar)  
sûdewatî: kelkperestî, feydeperestî  
tatîkî: tarikî (yanlamasına)  
têglîhiştin: fêmkirin (anlamak)  
vegotin: anlatmak  
vekolan: lêkolîn  
vekustîn: vemirandin  
verê: nîvîs, gotar  
waz: dîtin, raman  
xemşarî: sersaři, ihmalkarî  
yeknesak: monoton (tekduze)  
yeksan: wekî hev (esit)

## WELAT

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zeryâ Basın ve  
Yayncılık  
San. Tic. Ltd. Şti.  
(adına)  
Xwedi (Sahibi)  
CELALETTİN  
YÖYLER

NAVNIŞAN  
Ayhan Işık Sk. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX  
(0 212)  
251 90 13

Gerînendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
SAMÎ TAN

Berpîrsê Karêñ  
Nîvîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
M. SALÎH TAŞKESEN

Berpîrsê Saziyê  
(Müessese Müdürü)  
TÂHIR ELDEMİR

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.

BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTYÎN ME  
(Temsilciliklerimiz)

Brûksel:  
Medeni Ferho  
32 532 721 12 03  
Suriye:  
Jan Dost  
Helim Yusîv  
Berlin:  
Silêman Sido  
49 30 69 00 26 95  
Hannover:  
Selîm Biçük  
49 572 18 13 60  
Munchen:  
Mahmut Gergerli  
49 871 67 08 84  
Stockholm:  
Robin Rewsen  
46 87 51 05 64  
Bonî:  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49  
Hollanda:  
Ferhat Zebarî  
31 104 85 55 48

# Kedxwar li her derê Kmîrovan winda dikin

Li Kolombiyayê ji bo girtiyên politîk dadgehêne veşarî li dar dikevin. Li holê dadgeh tune ye, dadger û dozger tune ye, kes nizane tawanbarî ji hêla kê ve tê kirin, lê mirov têne cezakirin. Bêyî ku mafê parastinê bielinê. Mehkeme li pişt diwarêni bi hêli (neynik) pêk tê. Bersûc tu caran rûyê dozger û dadgeran nabînin.

SUNA ARAS

**D**u roj berî "komcivîna windahiyen di binçavan de", em li paytexta Kolombiya, li Bogotayê ne. Emê du rojê xwe bi serdanê li gel sazî û rôexistinê demokratik derbas bikin. Ji 30'î bêhtir sazî û rôxistin piştgiriya vê komcivînê dikin. "Yekitiya Piştgiri û Hevkarîye (ANDAS)" û "Danezana Navneteweyî ya Parastina Windahiyen di binçavan de (ICAD)" xebaîen komcivînê li Kolombiyayê bi rê ve dibin.

Glorya Mansilya Seroka ANDAS'ê ye. Berî 13 salî zilamê wê di binçavan de hatiye windakirin, ev 13 sal in ku, li hemberî windakirinê di bin çav de têdi-koşe. Em serdana xwe ya yekemîn li ANDAS'ê dikin, ew bi dilgermî hatin pêrgîniya me. Di nav xebatkarêwan ên dilxwaz de gelek profesor, parêzer xwendevanê zanîngehan û parêzvanê mafêni mirovan cih digirin. Cihê duye-mîn ê ku em ziyaret dikin "Konfedarasyona Navneteweyî ya Karmandan" e ku 150 hezar endamên wê hene. Zêdetirî 20 endamên saziyê û parlementerekî ji Partiya Komunist hatin pêrgîniya me.

Hevdîtina me ligel endamên rêvebe-riya Partiya Komunist a Kolombiyayê gelek baş derbas dibe. Weki ku ne li we-lateki ku salê "30 hezar kes" di bin navê "Oparasyona paqijiya civakî" de têne kuştin bin, gelek bi xwe ewle û bawer in.

Di serdanan de, ji ber ku em her kesî wiha baş dibinin dilê me jî rehet dibe. Roja 11'ê pûspéra 1997'an, pişti daxu-yaniya çapemeniyê, me kolana herî mezin a Bogotayê ji trafikê re girt û dest bi meşê kir. Delegasyonê ku ji her welati hatine, cihê xwe girtin. Rayedar û endamên Partiya Komunist a Kolombiyayê bi alên xwe besdari vê meşê bûn. Gelek sendika piştgiriye didin meşê. Em mirovîn ku ji 15 dewletan hatine, bi yek den-gî qîr dikin. "Heskiriyen me li ku ne?" Xwepêşandan û meş di bin bergirîyen ewlekariyê yên giran de 2 saet û nîv di-dome. Dewlet dest navêje metodên xwe yên navdar, çalakî bê destkariya hêzên dewletê diqede.

Li pansiyona ku em lê ne, saet 5'ê si-behî ye. Hemû delegasyon li ser piyan e, malbatêni wendahiyan, delegasyona ku ji gelek welatan besdar "bûne, amadekariyê xwe carâ dawîn di ber çavan re derbas dikin. Wê komcivîn li "Salona Pir-tûkxaneyê Bogotayê" li dar bikeve. Pir-tûkxane nêzîki pansiyonê ye. Komcivîn wê li salona zanîngehê çêbûya; lê ji ber pest û koteikiya dewletê ev yek/pêk nehatibû.

Dema em dikevin salonê, çente û bawol vedîbin. Pankart, wêne, diruşmeyê (slogan) ji her zimanî der heqê windahiyen de, bi awayekî xemgîni cihê xwe di-

girin. Dayikeke windahiyen ku ji Xirwatistanê hatiye û da-yika Hüseyin Toraman ku 5 sal berê winda bûye, li cem hev rûniştine. Her du dayikêni dilşewîti bi keser li amadekariyan temaşe dikin. Jina windahiyekî ku ji Filipinê hatiye, hewl dide ku banta li ser çoka xwe, bi destê xwe yê lerzok veke, lê nikare. Ez dibezi alikariya wê dikim, bi kenekî xemgîn spasiya xwe pêşkêsi min dike. Reynaldo Garcia navê mîrê wê yê winda ye, ew wêneyê Garcia dixe navbera wêneyê Talat Türkoğlu û Hasan Ocak..

Bi sedan sîmayêن xort, hin ji wan bi ken, hin ji wan xemgîn, di awirêni hin kesan de ja-neke ne diyar, windahiyen kolombiyayî, xirwatî, türkiye-yî, filipinî, mil dane hev, dîmena piştgiriye pêk anîne. Divê ez bibêjim ku ji destpêka komcivînê heta dawiyê Ernesto Che Guavera mîvanê me yê rûmetê bû.

Komcivîn bi besdariya 158 delega-syon, malbatêni windahiyen û ji 70'î bêhtir rôxistin û saziyên demokratik dest pê dike. Ji bîli axaftinê delegeyê 14 welati, Parlementerê Partiya Komunist a Kolombiyayê Felipe Santos, Wezîrê Karê Hundurîn ê berê Wazkuez, nûnerên sendikayan û malbaten windahiyen. Sekreterê Giştî yê Partiya Komunist got: "Ezê mafê xwe yê axaftinê dema ku ez hatim serdana we, bi kar bînim". Pişti re ji komcivîn silav kir û ji wir çû.

Ji gelên ku li Kolombiyayê dijîn, ji %70'î wan durehîn (melez) çermesorîn (kızıldereli) spanî, ji % 22'ê spanî, % 3'ê durehîn çermesorîn reşik (zenci), % 4'ên reşik (reşikîn ku ji bo koletiyê anîne Kolombiyayê), %1'ê wan çermesor in. Ji 200 zaravayê herêmî yên çermesoran bi tenê çend heb têne bikaranîn. Bi têne 2000 çermesor, hewl didin ku zimanê xwe bi kar bînin û çanda xwe jîndar bîhîlin.

Nifusa Kolombiyayê %70 li bajaran, % 30 ji li çolteran jiyana xwe didomine. Aboriya Kolombiyayê yên gavê di destê şirketên amerîki, îngilizî û axayê feodal de ye.

Hejmara windahiyen li gorî daxuya-nîyen serdozger 10 hezar û 500 kes in. Lê tê gotin ku hejmara rastin gelek zêdetir e. Di salekê de 30 hezar kes hatiye kuştin. Ji tevkuiyîn zarokên, kûçeyan û parsek ji xelas nabin. Berdevkê Konfederasyona Navneteweyî ya Karmandan Javier Giraldo dide xuyakirin ku ew li hemberî zilmê û qetliaman têdikoşin û gotina xwe wiha didomine: "Bi tenê di nava 2-3 mehan de 90 karker hatine kuş-



Dîmenek ji komcivîna windahiyen ku li Kolombiyayê pêk hatibû.

tin, 17 sendika hatine bombekirin, ji 200'î zêdetir karker ji ber pest û kotekiyan revîne derveyî welat, sendikavanek hê jî winda ye. Di sala 1997'an de ew kes sekreterê sendikayê bû, li herêma Mandalena hate windakirin. Li Kolombiyayê şerekî navxweyî vê gavê heye. Ji bîli têkoşîna sendikavaniyê em ji bo aştîyê ji hewl didine xwe. Em 80 sazi hatin cem hev û me komîte ava kirin."

Pişti re ji, mafê axaftinê Parlementerê Partiya Komunist a Kolombiyayê Felipe Santos digire: "Li ser Partiya Komunist gelek zordarî hene. Dewlet dixwaze me bajo nava xebatên ilegal, bi hezaran endamên me hatin kuştin. Bo nimûne UP ango Yekitiya welatparêz heta sala 1985'an têkoşîna çekdarî dikir. Di sala 1985'an de di pêvajoya "Efû û Aştiyê" de partiyek ji hêla 20 fermandarênen gerîla ve hate damezirandin, di hilbijartînê 1986'an de 300 endamên meclîsa belediye-yan, 5 serokatiya belediyeyan û 30 parlementer xistin meclîse.

Lê heta niha ji sê hezari zêdetir endamên wan hatin qetlikirin. Hemû rayeda-rên wê, 7 parlementer û 5 serokîn belediye-yeji hêla hêzên paramîlîter ve. Politikayan artêş kifş dike. Berpirsê hemû qetliaman artêş e. Li Kolombiyayê windakirin û qetlikirin li gorî zagona ne sîc e. Pêşniyazên ku em didin meclîse disa li me vedigerin. Ji milyonekî bêhtir mirov hatine koçberkiran. Dewlet li wan herêman, mirovîn xwe bi cih dike û ji bo ber-jewendiyen xwe giyayê kokaînê diçine.

Ji bo girtiyên politîk dadgehêne veşarî li dar dikevin. Mehkeme li pişt diwarêni bi hêli (neynik) pêk tê. Bersûc tu caran rûyê dozger û dadgeran nabînin. Di de-

ma darizandinê de mîkrofonên ku deng diuguherinîn, têne bikaranîn." dibêje.

Berdevkê Sendikaya Ragihandîne (Telekomünîkasyon) ji wiha dibêje: "Ez we hemûyan, li ser navê biratiya çinayetî silav dikim. Li Kolombiyayê dewlet zordariyê bi hêsanî dike. Rûdanûn ku di-qewimin, bi tenê ne li vir diqewimin, kapitalizm van yekan bi xwe re tîne. Diye em jî mîna gelê dînyayê yên bindest hêza xwe bikin yak. Ji ber pest û kotekiyan mirovîn Kolombiyayê direvin dicin Panamayê. Lî ev ne xelasî ye. Hêzîn faşîstîn ên çekdar heta Panamayê çûn û gelekeş kuştin.

Dema min ev nîvîs amade dikir, sîmâyîn li komcivînê axivîbûn qet ji ber çavê min nedîcûn. Stêrkên çavên dayika Hatice Toraman ku qet nedisekinîn. Ayhan Uzalayê ku 20 rojan di bin çav de mabûm dema behsa wan roja dikir rewşa dengê wî, çawa ku careke din wan rojan jiyabî dihate ditin. Bêcarietiya di rûyên malba-tên windahiyen de jana ku ji dengê wan dihat, di quncikêni herî dûr ên dilêne me de cihê xwe girt. Ez vê gotina ku sendikavanekî gotibû qet ji bîr nakim: "Ji bu ku em jiyane xelas bikin, divê em têkoşînê bikin, nexwe wexta me namîne ku em jiyane bijîn."

Pişti ku em bi rê ketin, hêzîn militarisit avêtin ser gundekî nêzîkê Bogotayê 30 kes hetine qetlikirin, serê wan hatiye-jekirin û bi daran ve hatibûn daleqandin. Her wiha sendikayek ku piştgiri daye komcivînê, hatiye dagirkirin, 2 rayeda-rên wan hatine revandin. Heta vê gavê tu salox ji wan nehatiye girtin.